



Jan Dost

Li ber ronahiya merqeda

Ehmedê Xanî



jandost@hotmail.com

Rojê bi ronahiya xwe serê çiyayê Gilîdaxê dişuşt, hewrekî spî û mezin, lûtkeyê berfînî ji ber çavan geh geh dida alî, tevî ku nivê temûza 1996'an bû jî, hewa nerm û xweş bû buhar dianî bîra mirov, gelek hestan xwe di bîra min de li bin guhê hev dixistin, ez bi hest û hebûna xwe ji der û dorê qut bûbûm, hema hema bibêje min tenê dengvedana sê sed salên bûrî dibihîst.

Ew dengvedana bi hêz ya ku tenê helbestên seydayê Xanî dinihirandin û dibilandin, Xanî yê kurê wî bajarokê di dawa wî çiyayê serbilind de xilmaşbûyî de. Ez ji şofêrekî bajêr nêzîk bûm û min pirs kir: gelo gora Ehmedê Xanî li ku ye?

- ziyaret?

Wî pirsê min bi pîrsekê bersivand, û min got erê.

Min û wî me li ser hundek pereyan li hev kir ku min bigihîne ziyaretê û vegehe jî.

Gora xanî çend kilometran dûrî rojhilatê bajêr e, ji wê deverê re dibêjin Bayezîda jorîn, rêyeke ji zuxur û kevirên hûrik ji Bayezîd digihê ziyaretê, di nivê rê de Qereqoleke artêşa Tirkî mîna dengê

tehl û zivir di nava sîmfonîyeke ciwan de xuya dikir, piştî ku em bi selamê jê derbas bûn û me nêzîkî li Gora Xanî kir, zarokî bi kumin spî hatine pêrgîna me, ew feqe yê xwendegehê bûn, li ber deriyê merqedê Micêwir(ew kesê ku li ber ziyaretan rûdine û kar û barên wan dimeşîne, ji peyva Erebi cîran û car û cawere hatîye) ew mirovekî navoser û dilovan û riheke sivik rûyê wî dinixumand,

bi germî hat pêşya min û ez birim ber kêla serê seydayê min Xanî.

Hestên ku di wê kêlîkê de êrîşî giyanê min kirin, ez ji binî de hejandim, her tişt hate bîra min, gilî û gazinên Xanî, perîşanîya Kurdistan û evîna dojhîn ya Mem û Zînê, min nikaribû xwe wê demê bigirta, hêsirên min zora mêranîya min birin û ez bi dengê bilind girîyam, heta min Micêwir jî bi girî vekir, xuyaye ku ew hest di nava dilê Micêwir de jî diqilqilîn û pêdivîya wî bi yekî hebû ku hinavê wî tev bide. Ber bi min ve hat û destê xwe da ser milê min bi bavîtyeke dilovan û bi kesereke dirêj got: kurê min xwedê me rizgar bike.

Ziyaret xweşik e li rex wê goristaneke giştî he ye, kevirên ku pê hatî avakirin sê rengin, spî û qehweyê tarî û yê vekirî yan hingivîn, gor hemî bi cawekî kesk nuxamtî ne li rex gora Xanî gorên şêx Taha yê Ervasî, şêx Resûl, şêx Mehmûd hene, li ser kêla serê Seyda jî ev ayeta Quranê heye: kullû men e'leyha fan...., yanî her kesê li ser (rûyê erdê) mirin dawî ya wî ye.

Şênîyên Bayezîd ê gora Xanî weke ziyareteke pîroz dihesibînin, gelek nexweş û xwedan derd û kul û evîndar diçin li wir tika dikin ku xwedê wan bide ber mezinîya Xanî û kar û barên wan ser rast bike, wek çawa ku li ziyareta Miştenûr li Kobanî û li gelek ziyaretên Kurdistanê yê din, li wir jî xelk keviran di dîwarê ziyaretê didin, eger kevirê wan bi dîwêr girt, ew nîşana pêkhatina hêvîyan e.

Ehmed Mustafa

roj.ava2011@gmail.com



Tucarî kesî welatê kesî rizgar ne kiriye

Yek hebû ew jî ji bo misilmantiyê kir..

Tê gotin ko -Artêşa Sûriya Azad- wê mafê kurdan bistîne. Lê gelo baweriya we heye ko ev Artêşa Sûriya Azad piştî şoreşa Sûriyê bi serkeve wê smafê kurdan bide wan an mafê wan biparêze!!.

Ez wek kurdekî gelek hêviyên min hene lê di dilê min de jî gelek tiştin dudilî jî hene

lê bawer bikin ez naxwazim kurdek li Sûriyê werê kuştin lê mexabin wek ez dibînim gelek tiştên ne baş hene û dibin.

Berî her tiştî ez çavên her kurdekî ji bo welatê xwe kar û xebatê dike, maç bikim.

lê ez hez dikim îro kurdên li sûriyê dijîn destên hev bigrin û li hev binirin û biçivin û di civînên xwe de bi rastî kar bikin.

Bêguman ez naxwazim Artêşa Sûriya Azad werin nav gund û bajarên Kurda

lê tiştê ji me tê xwastin em dijî rêjîma Es'sd derkevin û nehêlin Artêşa sûriyê Azad di nav gund û bajarên kurdan de bijîn...

kurdo eger tu bixwazî mafê xwe bistînî kar û xebata xwe ji bo welatê xwe bikî û ji bo kurdayetiye jî serî hildî berî hertiştî yekdest bin..yekarmanc bin..yekgotin bin.

Bêguman rêjîma As'sed niha dixwazê ev Artêşa Sûriya Azad herin gund û bajarên kurdan ji ber dest ji (Humesê û Hema) berdî û dest bi kurdan bikin da ko polîtike wan henkî werê guhertin.. û hinkî serbest rabin û dîsa kuştin û Helebçe werê meydanê. kurdo tucarî bawer mekin ko ev (Artêşa Sûriya Azad) tu carî mafê we ji were nastîne. kurdên hêja gund û bajarin xwe biparêzin. Dost û hevalên xwe biparizin deşt û çiyayên xwe biparizin her wiha kar û xebata xwe bikin...

guhdarî li hev bikin eger hûn hez bikin mafê xwe bistînin emê bi dest û milê xwe bistînin tu carî kesî welatê kesî rizgar nekirîye... yek tenê hebû ew jî ji bo misilmantiyê rabû ...

Bi baweriya min heta Es'sed hemû Sûriyê nekuje, ew naçe. Gengaz e dema ku hemû Sûriyê hildiweşîne, tiştêkî ser tiştêkî nehêle, êdî biçê. Rejîma Sûriyê gelekî hovane ye, xwînmij e, pêwîst e em hemû hewldanan bikin ku li navçeyên kurdî xwîn neyê rijandin.

KURT

û

KURMANCÎ

Hoşeng Broka

hoshengbroka@hotmail.com



Kurdistana „duyem“

Pirsa „Kurdistana mezin“, ku di serî de pirsra „xeyaleke“ bi Kurdî mezin e, ne pirsra Kurdekî, belkû ya çar Kurdan e, û ne ya welatekî, belkû a pîrr welatan û pîrr gelan e. Ew ne tenê pirsgirêkeke bi Kurdî, belkû bi Erebi, bi Tirkî, bi Farisî û bi hin zimanên din e jî.

Paş dora 22 salan ji rizgarkirina „Kurdistana yekem“ anku a Başûr(1991), û herweha dora 21 salan ji damezrandina yekemîn Parleman û yekemîn hukumeta bi Kurdî(1992), hîn heman Kurdistan di heman Iraqa xwe de, kê-m-zêde, pirsgirêka heman Kurdan û heman Ereban e. Kêş û vekêşên van çend mehên dawiyê, ku di navbera Bexda û Hewlêrê de, di kirîzeke mezin de, werbûne, nîşana herî nêzîk û berbiçav, a vê pirsgirêka mezin a navbera du paytextan, du alan, du zimanan, du gelan, du dîrokan, du ciyografîyan, du çandan û du aqilan e.

Kurd û Kurmancî, barê Kurdan û Kurdistanên wan, çî di dîrokê de, çî jî di anuha û paşerojê de, ne barekî gengaz û hesan e.

Helbet ev Kurdistan, ku di dîroka azadiya Kurdan de, paş „komara yeksalî“(komara Mehabad, 1946), Kurdistana rizgarkirina bi Kurdî a yekem e, ne berê mijara vê nivîsê ye. Berê vê nivîsê û herweha mijara wê „Kurdistana duyem“ e, anku Kurdistana Kurdên „binya xetê“ ye, ku di van heftiyên dawî de, bas li seranserî her çar aliyên Kurdan û herçar aliyên xwîna wan, basa pêdarî, rizgarî, azadî û bi-Kurdî-rêvebiriya vê Kurdistanê ye. Ev ne xewneke biçûk e, ku îro diçe realîzekirinê.

Sûrya paş „derbeya çarşemê“, ku di encamê de, çar ji mezintirîn girgîrêkên rejîma El-Assad, hatin kuştinê, derbasî qonaeke nuh bû. Sûrya, piştî vê „çarşema mezin“, êdî nema a berî wê ye. Her tişt, her kes, li her derê, Sûrya û Sûrya, roj bi roj, derbasî vê qonaxê û vê gorankariya dramatîkî, dibe.

Kurd jî, wek xelkekî resen ji xelkên vê deverê, ku rêjeya hejmara wan li Sûryayê ji 10% zêdetir e, di heman gorankarî û dramatîkiyê re, derbas dibin, û hewl didin, ku di „Sûryaya nuh“ de, bibin „Kurdên nuh“ yên „Kurdistana nuh“. Wate, hewl bi Kurdî îro roj, ew e, ku Kurd wek „netewa diwemîn“ paş Ereban, li Sûryaya dahatû, bibin xwedanên „herêma Kurdistana“ xwe.

Helbet ne ev Kurdistan ew Kurdistan e, ne Kurdên vê herêmê Kurdên wê herêmê ne, û ne jî ev Sûrya ew Iraq e. Lewre, bi qasî çitenî û zehmetiya Sûryaya paş Beşar El-Assad, bi ya min, dê ev Kurdistan jî çiten û zehmet be.

Ev Kurdistan, ne tenê bi dijmin û xêrnexwazên xwe zehmet e, belkû bi xwedî, dost û xêrxwazên xwe jî.

Bi qasî ku ew Sûrya paş rûxandina rejîmê, hîn nezal e, ev Kurdistan jî bi qasî wê Sûryayê û wê nezalîyê, hîn nezal e.

Ev rûyê bi Sûryayî nezal, bi qasî dest û lingên ku îro diçinê, nezal e.

Ya rast, ne Sûrya li hundir zelal e, ne jî li derve.

Ne „Sûrya Beşar El-Assad“ zelal e, ne jî a piştî wî.

Ne rejîm zelal e, ne jî rikberî.

Ne Ereberamberî miletên din ên Sûrî zelal in, ne jî ev miletên ji Sûryayê heta bi Sûryayê, beramberî wan, zelal in.

Her kes û her tişt, îro li vê deverê, ji nezalîyê diçe nezalîyê.

Helbet ev nezalîya rûyê Sûryayê, yê pîrr bi mij, ji mijê û di mijjê de, li ser hindê astan, û di hindê waran de, dikare were famkirinê, lê ya ku hîn di çarçeweya aqilê vê „Kurdistana duyem“ de, ku berê mijara vê nivîsê ye, nayê famkirin û qebûlkirinê, nezalîya Kurdên vê Kurdistanê bi xwe ye.

„Herêma Kurdistana duyem“ li Sûryayê, wek ciyografî, dîrok, çand, ziman û demografî, helbet zelal e, lê a li vir, ji Dêrikê heta bi Efrînê û ji Kobanê heta bi Qamişlo nezal, siyaseta Kurdan û vê Kurdistanê wan e.

Kurd, li vê deverê, ne bi Kurdistanê xwe a „duyem“ re zelal in, ne jî bi Kurdistanên din re.

Ew, ne bi hev re zelal in, ne jî bi Kurdên aliyên din re.

Ew, siyaseta û siyaseta, ne bi Sûryaya xwe a „bi Kurdî“ re zelal in, ne jî bi „Sûryaya Erebi“ re.

Ew, hem xwe bi xwe re, li şûna yek Kurdî, gelek Kurd in, hem jî bi Kurdên aliyên din re.

Ew, hem li Kurdistanê xwe ne yek in, hem jî li Sûryaya xwe.

Ew, hem bi xwe re, li Qamişlo ne yek in, hem jî bi Ereban re, li Şamê.

Eger em Kurdên di siyaseta de pasiv, li aliyekî bihêlin, mirov dikare Kurdên siyaseta aktiv li vê deverê, li ser çar Kurdan, parve bike: „Kurdên PYD“, „Kurdên Encûmenê“, „Kurdên hevrêziyan“ û „Kurdên hevgirtinê“.

Ev herçar Kurd, ne tenê berê çar siyaseta cuda, belkû çar Kurdistanên cuda û Sûryayên cuda ne jî. Wate, her Kurdekî ji van, rêya çareserkirina pirsra vê Kurdistanê, di paytextekê re dibîne. Pirsra vê Kurdistanê, berî Qamişlo, Efrîn û Kobanê, li paytextên cîranan, tê gengeşkirinê. Ew, berî pirsra Kurdan, wek pirsra Ereban û Tirkan, tê pilankirinê. Ê herweha berî pirsra „Kurdên Sûryayê“, ew wek Pirsra „Kurdên Iraqê“ û „Kurdên Tirkîyeyê“, tê hesabkirinê. Helbet, pirsra her Kurdekî li kîjan Kurdistanê dibe bila bibe, kê-m-zêde, a hemî Kurdan e. Lê ev nayê wê wateyê, ku Kurdên vê Kurdistanê yan jî Kurdistanêke din, wek sîha Kurdên hin Kurdistanên din, siyaseta û siyaseta, tevbigerin.

Mafê hemî Kurdan di hemî Kurdistanan de heye, ku wek hev, bibin Kurdên hev, lê bi ya min, mafê hîç Kurdekî li hîç Kurdistanêke tune ye, ku li dij hev, bibin sîha siyaseta hev.

Mixabin, ya îro li „Kurdistana duyem“, di hin deverên rizgarkirî de, dibe, ji lihevkirina Kurdan bihtir, wekî ku „rêkkewtina Hewlêrê“ daxwaz dike (11.07.2012), ew „dijhevkirin“ e.

Ya îro li „Kurdistana Sûryayê“, Kurd û Kurd, dibe, ji pêkhatinê bihtir keyslêhatin e, û ji jêhatinê jî bihtir lêhatin e.

Ew, ji siyaseta li Qamişlo û ji bo Qamişlo bihtir, siyaseta ji Hewlêrê heta Amedê ye.

Ew, hewldanek ji insyatîva Kurdên vê Kurdistanê bihtir, hewldanek di bin sîha Kurdistanên din de, û bi insyatîva Kurdên din e.

Dîroka herdu Kurdistanên cîran, ji Hewlêrê heta bi Amedê, dibêje, ku Kurdên „binya xetê“, ji Efrînê heta bi Dêrikê û ji Kobanê heta bi Qamişlo, ji Kurdistanê xwe bihtir, peyayên Kurdistanên din bûne, û ji azadiya xwe bihtir azadiya Kurdên aliyên din bûne, û ji xwîna xwe jî wêdetir şehîdên xwînen birayên xwe yên din bûne. Ev mafê „Kurdistana mezin“ e.

Rêya Kurdan, li her Kurdistanêke, li kêleka hev teqez, heye, lê rêya hîç Kurdekî li dij Kurdekî, li hîç Kurdistanêke, hîç tune ye.

Şensê Kurdan, li her Kurdistanêke, bi hev re, helbet heye, lê şensê hîç Kurdekî, li dij Kurdekî din, li hîç Kurdistanêke, hîç tune ye.

Bextê Kurdan, li her Kurdistanêke, bi hev re, bê guman, heye, lê bextê hîç Kurdekî li dij Kurdekî, li hîç Kurdistanêke, hîç tune ye.

Piştî 22 salan, vaye dîrok careke din, ji Kurdan re dibe şensek.

Ya îro li Sûryayê dibe, ji Kurdên „Kurdistana duyem“ re, şensêkî dîrokî ye.

Lê, şens bi tenê dîrokan ava nake.

Şens bi tenê, Kurdistanan ji Kurdan re, rizgar nake.

Şens bi tenê, Kurdan di dîrokê de, û herweha dîrokê jî di Kurdan, mezin û bilind nake.

Şens, îro roj, li vî aliyê Kurdistanê, ku aliyek ji „Sûryaya fêrmî“ ye, yê Kurdan e, lê pirsra herî giring, ku dikare şens û şens û Kurd û Kurd, were kirinê ev e:

Aya Kurdên vê „Kurdistana duyem“ çiqasî dikarin bibin şensê xwe?

Di „Sûryaya nuh“ de, îro roj, derfeteke duyem û şensek duyem hene, ku „Herêma Kurdistana duyem“ ji Kurdan re, bibe derfetek û şensek, lê pirsra ji vê wêdetir, ku dikare xwe çengî rûyê her Kurdekî bike, ev e:

Aya Kurdên vê derfet û vî şensê bi Kurdî duyem, dê çiqasî bikaribin, bi yek dengî, yek zimanî, yek dilî û yek aqilî, ji herêma Kurdistana xwe re, bibin heman derfet û heman şens?



Hevpeyvîna , ‘Pênûsa Nû‘ bi nivîskar û lêkolîner

Heyder Omer re

Nivîsevan û rewşenbîrên, ku ji bêrîkên xelkê bikin xirecir û galgal, tu nikarî hêviyan ji wan bikî.

- Çanda rijîmên zordest û dîktator bi wan ra nakeve.
- Gelek zîmbolên rikberiya Sûrî erebî nikarin xwe ji hizra rijîmê rizgar bikin.
- Wergirtzina mafên Kurdan li gel awayê tevdir û karê wan girêdayî ye.
- Nivîsevanê herî hukardar ew e, yê ku pêjna bûyeran, berî qewimîna bûyeran, dike.
- Nivîsevan û rewşenbîrên, ku ji bêrîkên xelkê bikin xirecir û galgal, tu nikarî hêviyan ji wan bikî.
- Gava tu kesekî din rexne dikî, ev rexnekirin rê li pêş te nagire, ku tu eynî wî mirovî bipesine.
- Realîte her tim astengiyan dide pêş xebitandina têoran, û nahêle bi wê hêsaniya têorî maf werin wergirtin.
- Wate û delameta şoreşê ew e, ku realîteyê ji binî de hilweşîne, û yekeke dine nû li ser kavlên wê bafirîne.
- Divê Kurd ji îro de, hîna şoreş li dar e û germ e, dest ji erkên xwe berndedin û mafên xwe nexin bazaran.
- Şoreş bê pirogram nabin; şoreş ne tenê rûxandina rijîma ye, belê nerîneke wê ya teyayî divê, û hemî warên jiyana gel analîz bike.

Pênûsa Nû: Şoreşa gelêrî ya miletê Sûrî ji 15ê adara 2011an ve berdewam e, tu wek nivîskar û rewşenbîrê kurdên rojava, asta beşdarbûna kurdan di şoreşê de çawa dinirxîn?

Heyder Omer: Tê bîra min, gava li başûrê Sûriyê, yekemîn qîrîn ji qirikên Derawîyan pişqî, di ser hemî bajarên Sûriyê re firiya, û pêşî li bakurê Sûriyê, li Qamişlo deng veda.

Ev yeka çî diyar dike! Bi baweriya min ev yeka ji xwe berê amadebûna Kurd ji bo serhildanekê, şoreşekê dide xuyakirin, pêre jî dupat dike, ku Kurd ji şoreşê ve ne dûr bûn, û ne jî dûr in, belê di navenda şoreşê da ne.

Gelek zîmbolên rikberiya erebî Sûrî vê gotinê dicûn û dubare dikin, ku beşdarbûna Kurd di şoreşê de lawaz e. Evqas xwepêşandanên Kurd yên ne tenê hefteyî û rojên Înê, belê rojan e li pêş çavên wan xuya nabin, kuştina rêberên hukardar mîna M. Temo û N. Berhek û dîlkirina çalakvanên Kurd nikarin nerîna wan biguhêzin, xebata Kurd, ku li dirêjîya temenê rijîmê rojekê sar nebûye, û zîndankirina Kurdan, ku zîndanên rijîmê li seranserî 50 salî ji çalakvan û xebatkarên Kurd vala nebûne, û serhildana Avdara 2004ê, ku yekemîn qîrîn bû li Sûriyê diwarê tirsê hilweşand ji bîra dikin, û nikarin bînin bîriya xwe, ku Kurd beşdarên yekemîn xwepêşandana Sûriyan bûn li pêş şalyariya navxweyî, li Şama paytext beriya teqîna şoreşê hema bi du sê rojan.

Mixabin hinek ji nav refê Kurd jî boçûna wan dubare dikin, pêre jî hem zimanê wan li ser Kurd dirêj dikin û hem jî xwe û gelê xwe dêşînin, ta radeya ku tu pê haydibî, ku Kurd ji bo xwe mazoşin e, ji dêvla xelk wan bêşîne, ew xwe bi xwe dêşînin.

Pênûsa Nû: Herêmên kurdan ji ber herêmên din ên Sûriyê ve aram in, ew tê çî wateyê?, tu ji beşdarbûna kurdan, partî û rêxistinên kurdan razîyî?

Heyder Omer: Kurd ji ber vê arambûnê de ne berpirsiyar in, ev yeka pilaneke rijîmê ye, armanca wê ji vê pilanê ew e, ku bide xuyakirin Kurd ji rijîmê razî ne, pêre jî Kurdan û Ereban bi hev re rû bi rû bike, tîkekê bixe nav xwepêşander û şoreşvanên Sûrî bi teyayî.

Pênûsa Nû: Tu dawîya şoreşê çawa dibînî?, ewê bi çî şeweyî bi dawî bibe?. Gelo kurd di Sûriya nû de dighên mafên xwe yan na?

Heyder Omer: Şoreş dê bi ser keve, ev yeka rastiyeke berz e, ji ber ku ev gelên, ku evqas qurbanî dane, nema vedigerin malên xwe, û rijîm jî dê hilweşe, lê bihayê serkevîtinê, wek min ji roja pêşî de texmîn kiribû, dê gelekî mezin be, ji ber ku ev rijîma totalîter weha diçe, ku serkevîna şoreşê ne tenê hilweşandina wê ye, belê qirkirin û kuştina zîmbolên wê ye jî, vê lomê dê heya ji wê tê berxwe bide, û xwîna hemwelatîyan birijîne, çiqas hemwelatî tîn kuştin, çiqas bajar, bajarok û gund tîn şewtandin û tarûmarkirin, ne xema rijîmê ye. Sernavê vê qunaxê, li gor hizra rijîmê, man û neman wê ye.

Lê bi baweriya min, şoreş bi hilweşandina rijîmê bi dawî nabe, belê divê berdewam be, ji ber ku çanda rijîmên zordest û dîktator bi wan ra nakeve, belê dem û xebat jê re divê, da ev çand jî bikeve. Nifşê, ku dê welêt bi rê ve bibe, piştî ketina rijîmê, di bin sîbera wê û çanda wê de perwede bû ye, rastiyan zanista derûnî (pisîkologî) teqez dikin, ku bandorên salên pêşî li derûn û kesayetiya mirov pir hukardar in, û zû zû bi alîkî de nayên têvedan. Vê lomê jî em dibînin zîmbolên rikberiya erebî bi heman awayê hizr û tevdirên rijîmê li tevger û mafên gelê Kurd dinerin, û nikarin xwe ji hizra serdestî rizgar bikin.

Lê ka Kurd, di Sûriya ya nû de, dê mafên xwe bistînin, yan na, ev yeka li gel awayê tevdir û karê wan hevbest e. Eger em bibêjim, ku wergirtina mafên Kurd

li gel yekîti û hevgerîna wan girêdayî ye, em wê hingê tu tişt û hizra nû diyar nakin, ji ber ku her kesek vê rastiye dizane, lê ka ev hevgerîna, heya îro pêk hatiye, an na?

Bi baweriya min, tevdirên Kurd, di mehên pêşî de, ji kongira Entalyayê di Hezîrana sala borî de bigir, û heya kongira ku berî sê heyvan li Istanbulê hatibû girêdan, gelek ziyar gihande Kurd, cimkê kesayetiyan Kurd bi piranî her kes hema ji xwe berê dibezîya wan kongiran, bê ku nûnerên wan di komîtên amadekar de hebana. Bi baweriya min evê yekê hundirê Kurd li pêş xwediyên hizra şofen û keysenbazên rikberiya erebî li ser piştê vekir, û ew pê hay kirin, ku refên Kurd pir in, dê karibin hinekan ji wan li rex xwe deynin. Beriya demekê min gotarek bi zimanê erebî weşand (Lezçûnê çî bi me kir û dê çî bike), tê de li ber vê xalê rawestiyam, xwendevan û hevpeşer dikarin wê gotarê di vê lînkê jêrîn de bibînin:

http://www.efrin.net/cms/erebi/index.php?option=com_content&task=view&id=9184&Itemid=99999999&Itemid=1

Hinek ji texmînen min, di vê kongira Qahîreyê, ya dawî de (2-3. 07. 2012) bi cih hatin, û me dît zîmbolên rikberiya erebî bi çî awayî nerînen xwe li ser doz û mafên Kurd dane xuyakirin. Bi baweriya min hebûna Kurd di wê kongirê de bi awayê çar gurûpan, an jî çar şandan ji bo helewsta zîmbolên rikberiya erebî alîkar bû. Lê tevî qerebalixa wê kongirê jî, bi baweriya min, gava hemî nûnerên şandên Kurd, tevî ku di nav sê gurûpên rikberiya Sûrî de par vebûne jî, (encûmena niştîmanî Sûrî, desteya hevrêz û hin gurûpên xortan) ji bilî encûmena niştîmanî kurdî, gava ewan nûneran, tevî vê belavbûnê, gihan yek helwestê, û yek gotinê, nameya Kurd, bi serenavê herî eşkere, ku Kurd dikare yekhelwestê bigire, gihandin şagirtên çanda serdest. Mirov hêvî dike, ku ev helwest bidome û hêzdartir bibe.

Tevî ku ez ne hevalê wê yekê me, ku Kurd xwe ji kongiran vekşênin, lê ez dikarim weha biçim, ku ewê vekşandinê ji hemî endamên rikberiya erebî û mêvan û çavdêrên kongirê re, wek min li jor got, da xuyakirin, ku Kurd dikarin bibin yek û yek helwestê bistînin. Gotin û nerînen di pêy kongirê re, nemaze jî ji hêla ewên ku nerînen û boçûnen şandên Kurd vîto kiribûn, di alava medya de dertên, didine xuyakirin, ku ewan ji nû ve bi giraniya Kurd hay bûne. Gelo nûnerên Kurd û sazî û rêxistinên wan dê karibin vê yekê bi kar bînin, û yekhelwesta xwe bidomînin?!

Hema bi kurtahtî, rewşa Kurd dê careke din veneger beriya Avdara 2011ê, ango para Kurd dê di destkeftiyên şoreşê de hebe, lê ew par dê bi qaserî hêviyên wan bin? Awayê tevdira wan dê bersiva vê pirsê bide.

Pênûsa Nû: Tu helwest û gotara nivîskar û rewşenbîrên kurd di wexta şoreşê de çawa dinirxînî?, gelo di asta şoreşê de ne yan ew jî hîna li kesayetiya xwe digerin?.

Heyder Omer: Bi nerîna min nivîsevanê herî hukardar ew e, yê ku pêjna bûyeran, berî qewimîna bûyeran, dike, bi vê nerînê, ez dikarim bibêjim, ne tenê nivîsevanê Kurd, belê hemiyên Sûrî, pêjna şoreşê ji berhemên wan nedihat; ango wek çawa şoreşa gelên sûriyê ji bo siyasetmedaran nişkavî bû, weha ji bo nivîsevanên Sûrî; çî Kurd û çî Ereban yên din jî nişkavî bû; ango pêjna şoreşê ji berhemên wan nedihat. Diwarê tirsê li ser sîngên hemiyên hatibû avakirin, vê lomê jî tu berhemên, ku zordestiyê, bi hemî awayên wê, çî civakî, û çî aborî û çandî, û gendeliya, ku heya qirikê hemî warên jiyana sûriyan girtibû, û serdestiya hêzên ewlekariyê di her warên jiyana sûriyan de, riswa dikin, nabînin.

Hevpeyvîn bi hunermend **Zubêr Salih** re

Raste 35 sal in heger ne bêhtir be, lê mixabin qet carekê jî ne hatime xelat kirin û ne bi gulekê.



Qado Şêrîn û hunermend Zubêr Salih

Qado Şêrîn: Hunermend Zubêr Salih wek stranbêjê helbesta Melayê Cezîrî hatiye naskirin, gelo çima te ew şeweyê helbestan hilbijartiye?

Zubêr Salih: Berî her tiştî spasî û bi xêr hatina we dikim .

Cizîrî Felsefak gelekî Kûre Dema helbestê Cizîrî dixwînim hestekî nikarim bînim ziman tede dibînim dinav wesf û hestê wî de wenda dibim û li kurî nerîna min ji arkê her hunermendekî ye ku li Cizîrî bi xwedî derkeve, ji ber ew bingehin, Cizîrî û hem jî Feqê Teyran û Ahemedê Xanî, ev dîroka mene .

Qado Şêrîn: Bi gumana min helbestvanên stranan nîn in, tu li kur çî pîvanan helbestan bo şeweyê xwe yê stranbêjiyê hildibijêrî?

Zubêr Salih: Raste yê ku helbesta stranê dinivîsin pir kêmin mixabin, lê car cara peyda dibin lê pir kêmin, û ji ber wê yekê min gelek helbestê stranê xwe min bi xwe nivîsîne û inkar nakim min helbestê pir helbestvana jî kutiye, Mînak wek (Xemgînê Remo, Seydayê Tîrêj, Bêbuhar, Cafer Taha, Melayê Cizîrî, Xweşnav Silêman, Kerîmo), û gelkî din jî û ku helbest ne nêzîkî hestê min be ez qet nikarim wê helbestê bêjim .

Qado Şêrîn: wek ez dizanim tu hemû awazên xwe çê dikî?, ta çî radeyê ev yek dikare guhertin û pêşketinê bixîne awaz û mûzîka te de ?

Zubêr Salih: Ji xwe tiştê herî giring ewe ku ez Awazê stranê xwe bi xwe di afirînim û ev yek dibe sedema ku rengê mûzîka min cudaye û dimîne stayla Zubêr Salih, û ev mijar bi rastî mijarek pir girîng û ber fireye, lê ezê bi kurtî bêjim, sedema muzîka me ku îro tev di yek çarçovê deye sedema mezin jî ewe ku Studio ya ku Muzîkê van hunermendê mey nûjen çê dike, yek Studio ye û yek muzîsiyane û ji ber wê yekê tev yek renge berî dengê hunermend bê te tu nizanî bê ev stran wê kî beje ji ber mûzîk tev kopîye ke.

Qado Şêrîn: kî rabûye û Vîdyokilîpan çê dike, ji wan weyê bi Vîdyokilîpan dê bibin hunermend, tu vê yekê çawa dibînî?

Zubêr Salih: Ev yek pir şaşê, huner ne wisa hesane, hunermend gerek dîrokek wî hebe û baş di nav hunerê de keliya be ta ku bibe hunermend, bê guman pir jî hene bi dehê salan jî di nav hunerê de ne lê mixabin dîsa nebûn stêrk û ne çirîsîn, yanî xwe li hunerê kirine bele û her berdewam dikin, tevî ku ne hatin hezkirin û ne tişkî balkêş jî dan, ne di warê evîne de û ne jî di warê netewê de, klîpek ne bese ku bibe hunermend, ev 35 sal in ez hunera xwe bi rêve di bim û bêhtirî 20 berhemên min hene û bi dehan jî şagirtê min çê bûn û bi hezaran jî min şev û konsêrt û bername û dawet û hevpeyvîn çêkirin û hîn ez ji gotina hunermend fedî dikim tev ku beşekî ne hindik ji her çar perçê kurdistanê heyanê min hene, ji bo wê yekê dibêjim klîpek ne bese û gerek bingeh hebe .

Qado Şêrîn: Çî cudahî di navbera hunermend Zubêr Salih û hunermendên din de hene?, ji boyî çî gerek em li te guhdarî bikin?

Zubêr Salih: Cûdahiya min rengê min î taybete ji bo wê yekê tu li min guhdar dikî, ji ber ez ne kopî me û tenê Zubêr Salih yek heye ne dido, ev sedeme û ya din jî ji ber ez strana xwe nabêjim heger ew stran berî her kesî ez jê hez nekim û dengê min î nerm heye ku zû li dergehê dil dixê .

- ji min bê xwestin ez ji bo azadiya welatê xwe karim çekê jî rakim.
- Pêşnyarek min ji nivîskaran re ye: nivîsên xwe kin bikin.
- rengê mûzîka min cudaye û dimîne stayla Zubêr Salih
- ev 35 sal in ez hunera xwe bi rêve dibim.
- Ez bûm pir di nabera du cîlan da.
- lê qet ne bûme hevalê tu rêxistin û partiyên.
- 35 sal in hunermend im, û bi gulekê jî nehatime xelatkirin.
- Yekem tişt, ezê biçim ser gora şehîdên 12ê adarê.

Qado Şêrîn: stran û mûzîka Zubêr Salih ji hêlekê ve û ya kilasîk û nûjen ji hêla din ve, tu xwe di kîjanê de dibînî?

Zubêr Salih: Ez bûm pir di nabera du cîlan da, di nabera M.Şêxo û Sa'îd Yûsiv û M.Ezîz Şakir de, ev ê ku berî min bûn, lê ez bi wan re jiyam û hem jî bi cîlê nûjen re û li kur baweriya min di her du beşande jî cîkî min î taybet heye, ji xwe kilasîk ew di rihê min deye .

Qado Şêrîn: Diyar e tu hunermendekî giştî yî, ji bo tevaya gelê kurd stranan dibêjî, lê çima tu ne bi hêz û aliyên siyasî re yî?

Zubêr Salih: Ez ne dîrî siyasî me, lê qet ne bûme hevalê tu rêxistin û partiyên, ez vê yekê vekirî dibêjim û ez wisa jî xwe rihet dibînim û rêza min ji her rêxistinê re heye û çî kesê tişkî baş ji bo welatê min bike rêza min jêre heye heta dawî ez dixwazim hunermendekî Kurdistanî bim û kîjan rêxistin min vexwendî çalakiyên xwe dike ez bi hestekî bilind tevî dibim û ji min bê xwestin ez karim çekê jî rakim ji bo azadiya welatê xwe .

Qado Şêrîn: Temenê te yê hunerî dirêje, li gora em dizanin dighê 35salan, gelo tu carinan hatiyî xelat kirin?

Zubêr Salih: Raste 35 sal heger ne bêhtir be, lê mixabin qet carekê ne hatime xelat kirin û ne bi gulekê, lê xelata herî mezin ji bo min hezkirina gelê min ji min re ye, û ew xelata herî mezine. Wê baş ba ku bi kêmasî di van 35 salan de carekê ez hatibama xelat kirin, lê gelê me hînî vê çandê ne bûye, û piştî hunermend ji nav gel bar dike êdî tê xelat kirin, lê gotinek heye dibêje: di hebûna min de gulekê diyarî min bike çêtire ku piştî bimrim tu gurzê gula bîne ser tirba min .

Qado Şêrîn: bûn 35 sal tu stranan didî gelê xwe û carekê jî nehatiyî xelat kirin, êdî tê hêza berdewamiyê ji çî bistîni?

Zubêr Salih: Hêza xwe ji hezkirina gelê xwe digrim ew besî mine

Qado Şêrîn: Tu wek hunermend ku kêlî bi kêlî bi şoreşa gelêrî ya gelê Sûriyê re dijî, tu helwest û tevîbûna hunermendên kurd çawa dinirxîni?

Zubêr Salih: Pir kême û ne li gora bejna vê şoreşê ye, gerek bû em bi berhemên pir xurt li kêleka gelê xwe ba na .

Qado Şêrîn: hunermend Zubêr Salih piştî serkeftina şoreşê dê çî bike, çî nû bikeve jiyana wî?

Zubêr Salih: Yekem tişt bikim wê serdana Kurdistanê be û ziyareta ser gora dayka min be û gora şehîdên 12 adarê û vê serhildan be.

Qado Şêrîn: Çî piroje û stranên nû yên Zubêr Salih hene?, tu çî mizgîniyê didî hezkiriyên xwe?

Zubêr Salih: Klîpek min nû heye di montajê deye, hêvîdarim bi dilê hezkiriyên min be, û her weha CDêk ku ji helbestê Melayê Cizîrî û Feqê Teyran û Ahmedê Xanî, ew jî proja min î nûye.

Qado Şêrîn: tu rojnama "Pênûsa Nû" çawa dibînî?, tu çî ji me û xwendevanên rojnamê re dibêjî?

Zubêr Salih: Serkeftinê ji Pînûs re dixwazim, û rojnemak pir serkeftîye û spasya we dikim ku we ev derfet da min û we xwe westand û bi taybet spasya te dikim hêja Qado Şêrîn.

Pêşnyarek min î pir picûk heye ew jî ji nivîskaran re ye:

Hinekî nivîsê xwe kurt bikin ji bo em karibin bixwînin, ji ber dem pir girînge, mijara bi sê rûpela me re kari di rûpelekê de bide xuyakirin û spas.

Cil û bergên jinên kurd ên êzîdî yên Kafkasyayê



Pîrekeke êzîdî ji Guçistanê, 1920



Cil û bergên jinên êzîdî, ji Tîblîsê, 1922

Li cîhanê her gel, bi çand, tore û kevneşopiyên xwe tên naskirin. Nasnameya gelekî; bi çand, kevneşopî û kelepura wî xwe dide der. Bi taybetî jî, di warê çanda xwekirinê de, her gelek xwedî cil û bergên bi şewazên cihê cihê ye. Wekî hemû gelan gelê kurd jî, bi çand, tore û kevneşopiyên xwe yên cihêreng balê dikişîne û wek xezîneyeke dewlemend ya dîroka civakî ye. Lê wekî hemû qadên jiyane nebûna welatekî yekpare, di warê cil û bergan de jî di nava kurdan de cihêtiyek derxistiye holê. Ji ber vê yekê jî her parçeyek Kurdistanê, her herem û her hawirdorek, di warê modelê de xwedî hin xweseriyên taybet e. Ligel parçeyên Kurdistanê jinên kurd yên li derveyî welêt, bi taybetî jî yên ku li Kafkasan dijîn jî, bi cil û bergên xwe yên xweser û cihêreng balê dikişînin. Heya roja îro jî, kelepore lixwekirinê hîn tê parastin, bi taybetî jî di nava jinên temen-mezin de. Lê çî mexabin ku bayê guherînê yê demê êdî hêdî- hêdî berê xwe daye wan jî...

Bê guman wekî gelek warên jiyane, di warê cil bergan de jî xaka ku mirov li ser dijî diyarker e. Ango cil û bergên ku em li xwe dikin raste rast bi dîroka me û xaka ku em li ser dijîn re girêdayî ne. Yanî girêdaneke mezin di nava xaknîgariyê û kelupora civakekê de heye. Dîsa di warê cil û bergan de; ol û aborî jî diyarker in. Lê ev hemû hêman bi hev bandor dibin û bandorê li hevdikin; tu caran ji hev cuda nabin.

Kurdên li Qafqasya (Ermenistan û Gurcîstan) jî bi pirahî kurdên ji ola Êzîdî ne. Ev kurdên ku ji heremên Kurdistanê yên wek (Qers, Sînek, Şerfedîn, Mûş, Îxdîr û Wan ê) koç kirine hatine van deran; hîn jî bi çand û kevneşopiyên cîhên ku lê hatî bi xwere anîbûn dijîn. Di warê cil û bergan de jî ew yek wisa ye û hema- hema di vî warî de jî hîn tişteke wan neguheriye. Ev yek bi taybetî ji bona jinê derbas dibe; jiber ku cil û bergên mêran(zilam) hatine guhertin, lê jin hîn li ser kevneşopiyên xwe yên Kurdewarî dimeşe.

Kurdên Êzîdî yên ku li Qafqasya dijîn; bi pirahî li bajarên wekî Qers, Wan Bitlîs û bajarên din hatine. Wan çand û cil û bergên xwe jî li sînoran derbaskirine û bi xwe re anîne. Ew hîn jî cil û bergên wekî kesên li aliyê sînor ên din, ên ku qet nedîtine lixwe dikin. Ew li pişt sînoran dengê dohol, zirne, dawet, stran û çekan guhdarî dikin û xeyalên rabirdû û pêşerojê dikin. Ji ber ku bi dîtina wan, ew deng û rengê kal û bavên wan in. Çendî ku cudatiyeke olî di nava Kurdên herdu aliyên sînor de hebe jî, lê mirov dikare bêje ku kelopor û awayê jiyana wan ya civakî wek hev in. Ev jî derdixê holê ku cilên jina Kurd-Êzîdî ya Qafqasya, ne hêmaneke olî ye. Yanî ne cilên olî ne, lê ewna cilên netewî yên herema Serdeha nin. Jixwe cilên jineke Kurd(misilman) ya li Qersê dijî, weke ya jineke Kurd (Êzîdî) ya ku li Elegezê dijî ye. Di heman dem de, dema ku mirov mêze dike, dibîne ku cilên jina Kurd-Êzîdî ya Elegezê, ne weke ya jineke Kurd-Êzîdî ya çiyayên Şengalê ye! Ev yek jî dide nîşan ku cil, berg, kultur û şemala jinekê, ji hêmanên olî bêhetir, bi hêmanên aborî, xaknîgarî û şewazê jiyane re girêdayî ye.

Nav û taybetmendiyan resen yên

Cil û bergên

Jina Kurd ya Qafqasya

Di warê model û şewazê de, di kincan de hin guherîn pêk hatine. Her wiha hin modelên nû jî hatine bipêşxistin. Li Qafqasya, bi taybetî jî li Ermenistanê, kurdên li herêma Elegez, Oktonberya û Şamîramê cil û bergên xwe yên kevneşopî berdikin. Belkî ku yên ji wan diçin komarên Rusyayê, an jî Ewropaya rojhilat, dev ji lixwekirina cilên Kurdî berdidin. Lê yên ku li qafqasya di nava gundan û heremên çiyayî de dijîn, hîn; serê xwe bi "hîrbî", pêşiya xwe bi "pêşmalê", piştî xwe "kefiye" girêdidin û "elêk" li ber dikin.

Me der barê mijarê pirsên xwe yên wekî, "Jinên ciwan yên li Qafqasya û bergên çawa ber dikin, yên pîr cil û bergên çawa ber dikin?" aresteyî dayîkeke temen-mezin a ku li herema Elegezê dijî kir. Dayîkê wiha bersîva me da:

"Niha cil û bergên jinên mezin li xwe dikin, wekî cil û bergên ku li walêtên bav û kalan tene berkirin e, modela wan yek e. Lê jinên ciwan van kincên berê-yên ku kurmanciyê temsîl dikin- zêde ber nakin. Tenê di şahî û dîlanan de ber dikin. Ji ber ku em di nava gelên din de dijîn; ciwan di bin bandora wan de dimînin. Jinên temenê wan mezin hîn jî pêşmalê li pêşiya xwe girê didin, yêlek ber dikin. Berê mezinên me Qutik ber dikirin. Niha tam nayê bîra min, li niha tam wekî Qutikê nebe jî pêşmal û kefiye û kremsatine tene berkirin. Şaxrareşiyê jî li serê xwe girê didin. Lê wek me got, ji ber ku em di nava gelên din de dijîn bandora wan a li ser cil û bergan tê dîtin. Ciwan di bin bandora çanda wan de dimînin. Serê xwe girê nadin. Kincên modern ber dikin.



Xanimên êzîdî ji Tîblîsê, 1945

Dema ku em diçin dawetan kincên wekî yên ku em di jiyana rojane de berdikin, lê ew bi qumaşên bibuha hatine çêkirin ber dikin."

Di jiyana rojane ya jinan de jî, cilên bermalê tene liberkin, her wiha jî jina Kurd ya Qafqasya, serê xwe bi awakî xweser û cuda girêdide.

Li nava Kurdên Qafqasya, bi taybetî jî Ermenistanê de, tiştî herî girîng ewe ku jinên temen-mezin hîn jî cil û bergên ku kurdayetiyê temsîl dikin ber dikin. Lê di nava ciwanan de, di warê çanda berkirinê de gelek tişt diguherin.

Dema ku mirov bi giştî li cil û bergên jinên kurd yên êzîdî yên li Qafqasya dijîn mêze dike, ji ber ernîgariyê her çiqas hin guherîn pêk tene jî, dîsa dişibin cil û bergên jinên kurd ên misilman ên li Wan, Qers û bajarên din. Jixwe demê ku mirov di mehên buharê de diçe zozanên Elegezê û jina kurd li wir dibîne, mirov yekser xwe li Kurdsitanê hîs dike. Birastî jî tiştêkî pir balkêşe ku piştî 90 salî ji koçkirina ji welat û jiyankirina li xerîbiyê hîn jî jina Kurd rastiya xwe ya resen diparêze û nixê kurdewarî nake qurbana moderinîzmê. Hîn jî ew kincên ku li cih û warên bav û kalan bi xwe re anîne vedişêrin û diparêzin, ji dê derbasî keçê an jî bûkê dibê. Hîn jî jina Kurd bi serbilindî eşker dike ku parzvana kelopora kurdetiyê ya sereke ku tu caran binkeftin nepejrandiye ew jina Kurd bi xwe ye!

[wikipedia](https://en.wikipedia.org/wiki/Kurdish_traditional_clothing)

Gerdeniyêke kurdên êzîdî yên Gurcistanê



danhev û lêkdan:

Mihemed Cezawîr Hemkoçero

Ji dengbêjê navdar: **CEMÎL HORO**

dengbêjê nemir yê navdar
ta roja îro navê herî girane û cihê xwe di nav
kultur û stranbêjiya Kurdî de li Kurdxê giran girtiye !



LAW BAVO

Erê min go law bavo law bavo law bavo law bavo
Zalim bavo, bavo...
Ez di bîra xwedê me, bîra gola hişîn im
Ji te bistîne taqeta kaba roniyêd her du çava
Ê law zalim
Tu xêre soza min nadê lawikê aşiqî, delxecî, peyayê
ber masa
Ez bi qurbano ewê bejin ziravo...
Tu soza min didê mêrê pîsî, çirkînî, genî
Erebê çolê, li bin xwe nabîne, ez bi qurbano
Parîk hesîr û perçak kulavo...

Tu li kuderê arikî kêsa û sergînê dibîne, tu guliyê mi
rebena kîbar tîne bi ser vedidê navo...
Ê law bavo law bavo law bavo
Ez di bîra xwedê me
Bîra gola hişîn im
Heta çerxa felekê şên e
Tu di mala xwe de nebîne
Bûk û zavo...

Ê lê anê eza nesax im
Lê dayê eza nesax im
Yadê eza nesax im... anê ... oy..
Anê serê mi bi qurbanê eza nexweş im
Ez vê derman im
Ez çiqas geriyam li ser hekîm û doktoran, ser
cerahan
Serekê doktoran bi mi re got ez ne Luqman im...
Go, xwedê derdê te nedê dar û berê ça û çola...
Sibe bû ro çû ava di bin barbarê kerebê û mû'eyenê
Ez pê nizanim...
Ê lê anê ji mine ez ne e'let im
Oyî dayê ez ne wêran im...
Heyfa şahad û dîploma di berîka doktor de
Heyfa ûmrê li xerîb û xurbetê çirmîş bûye
Ez ji doktor çêtir zanim...

Ê lê anê hefkî dengê lawikê aşiqî delxecî dibîsim
Kela dilê mi radibe di ber re
Qîrîna dengizê, pêla behrê
Di ser hev re diqulibe
Yadê loma maka ez pê nikanim
Ez di bîra xwedê me
Wîn ji ber gunê mi ve qismetê kûrm û kêzêd axê bin
Ev neqla çarê ye ez dibêm bavo werin mi bidin

lawikê aşiq
Serdarê xorta peyê ber masa
Mi medin mêrê pîsî genî
Mi gunê ye ez ne liyaq wan im
Erê bavê mi rebana kîbar dibê
Ezkê bi camêriyê û însanetiye çibkim
Kî çar quruşa zêde midê dibe ez hevalê wan im,
wî...wî...

Ê ne mi go gelfî birano xwedêkê ezê di va rona de
bimrim
Wînê tirba mi di koka til kin
Xwedêkê ezê di va rona de bimrim
Ez di bextê we de
Wînê tirba mi di koka til kin
Yacîkî tirba mi bi rihan kin, aman
Yacîkî ji mi re bi gul kin...

Erê mi go heval û ehbabê mi tune ne li hêteka çayê
kurmênc
Werin tirba min bipên dijmin û neyarên pir in
Tirsa min e ji wê tirsê
Werin ji ber serê mi lawikê xelkê
Gul û rihana hilkin
Oyî ...oyî ...oyî oyî nemîn çav reşê

Erê go aman e di bextê we de me, di bextê we de me
di bextê we de me...oyî
Dijmin û neyarên mi pir in
Tirsa mi werin ber serê mi
Gul û rihanan hilkin
Wînê dilê mi ji qefesa sîngê mi biderxin
Bi agirê dara bişewtînin...
Ji teqilê çavê reş û belek re, ji xelkê kîbar re di şîşa
kil kin
Aman e di bextê we de me ji wê kilê nedin tu keça û
bûka
Tevda bi nesîb û qismetê xelkê kîbarî fodil kin..oyî
Erê serê mi bi qurbano tevda bi nesîb û qismetê
Xelkê minî nazikî kîbarî fodil kin...oyî
Belkî di dû mi re xelkê nazikî kîbar bimirê
Wînê tirbê di kêleka mi de bikolin
Tirba me her du aşiq û bîlmeza
Ez di bextê we de me di hev re qulkin
Destê min î çepê derbas cem xelikê kîbar kin
Di mabêna kerês û dil kin...

Wînê destê min î rastê bavên orleqa zûyê memika
Di mabêna sîngê kalî û gewr û kefenê şil kin
Oyî oyî oyî nemîn çav reşê...

Ê ne mi go
Zalimê dîne anê eza nexwaş im
Lê dayê eza nesax im, yadê
Ê lê anê eza nexwaş im, yadê sox
Nefesa paşin me ez pir helak im
Tu deyaqa didê ber dilê mi rebenê
Tu dibê ez ê te bikim bermaliya
Lawikê delxecî, anê bi xwedê ez înan nakim
Oyî oyî oyî oyî... nemînim lawiko
Ê lê dayê serê mi rebena xelkê bi gurbanê yadê
yadê...
Bi mi re mebên em kê te bidin
Kurê bega û paşa, e'hd û qirar bê
Ez guh li we nakim oyî oyî
Ji yataqa şêrê bi nîşan derbas bê
Ez qula rkoviyan qebûl nakim
Şûr û qelqanên mi tune ne
Lê anê, bi esî re herbê nakim
Ez ê ji sibê û heta bi hêvarê bi ça û berbendên asê
kevim
Li serê qerm û qiracan bisekinim
Hêstirên xwînê bibarînim
Di ber re guliyê sor libakim
oyî oyî oyî yoî.. ez bimirim lawiko
Ê lê dayê ev neqla çarê ye
anê ev neqla çarê ye, kûr bê...
ez dibêm lawiko serê mi bi qurbano wer mi bibe
ez fîdayê te me...
li mi difilê bi mi re dibê ez Kurd; pak im.
Dibê ji şerefa mi re pir ey' b e û qusûrek
mezin e, yadê...

Li ser erdê xwedê li bin çerxa felekê
Ez pêl namûsa milletê kurda nanim, erzan nakim
Anê madem lawikê aşiq hev mêra ye
Dayê hev mêra ye
Mila goştê pezê mê li mi heram û tobe bê yadê
Li ser erdê xwedê ez mêra nakim
Oyî oyî oyî oyî, oyî ez bimirim lawiko

Arşevê Oskan

Axaftina Awiran



Zinar li odeya xwe rûniştaye, mîna hercar û şevên xerîbiyê dijmêrin. Li welatên ku tu girêdanê bi giyanê wî re çênake. Ax û ava van welatan, tîna dilê wî naşkîne. Êvar e.. bêdeqê li ser rûyê aso paldaye û bûye dema hijmartina kêlîkan û avjeniya hêviyan.

Li der ve dengê pêlavên jinan tèn guh.. teq.. teq.. teq. Xirecîreke nû, li ber deriyê avahiya penaberan heye. Bixêrhatin û kenên ne ji dil, xwe li bêdegiya şevê dipêçe. Mêvanên nû hene, kesine li avahiyê zêde bûne. Ew kî ne .. Ji kû ne ..? Zinar bersiva vê pîrsê nizane, lê xuya dikin, ku ji welatê Rûsiya ne. Hijmara Rûsyan li avahiyê, ji ya herkesî bêhtir bûye. Hîna birînên şerê diwemî derman dibin, li warên xwe vedigerin, xwe ji birçîbûna wan welatan rizgar dikin.

Deng li salonê li hev dizîvîre. Zinar jî dixwaze, ji wan deng û awazên jinan têbigîhê, ku çi wate di hundirê wan mebestan de heye. Wêkî ku ferheng, bi wan peyv re serxweş û mest dibe. Peyv digîrijin û li wan awazan tene siwarkirin. Ji wan dangan gelek ferheng tèn afirandin, ken, awir, tevger, çûn û hatin.

Zinar jî pesporê ferhenga awiran e, bi gelek zimanan dikare awiran şirove bikin. Çîrok û çîvanokan jê der bibire. Zimanê evînê li cem Zinar, awirên tûj û nerm im. Kenî û silav in, sipasî û xatirxwestin in, rûniştin û rabûn in...

Bi hilatina rojê re, sibeheke evînî bi Zinar re keniya. Jineke Rûs, bi kalemêrekî por sipî re dimeşe, keç e, jin e, xwişk e.. kes bi raza wê nizane. Xwe pir naspêrin hev, awirên evînî li çavên hev naxwînin. Mêr xweşî, hêvî û şadûmanî, li dût rojên xwe jibîr kiriye. Jin jî bedewî, ciwanî, jîn û jiyân, li bejna xwe pêçaye. Herdu bi zimanê elmanî nizanin, panaber in, biyan û mêvan in. Çavên xwe li derî û derfetan digîrin. Bi kesayetê qels û şikestî û bê moral ji Zinar re diyar dibin.

Zinar bi çend mehan ji wan kevîr e, silav û bixêrhatinê dide û destê alîkariyê dirêjî wan dike. Bi silava yekem re, çend kêlîkan li çavên jinekê dinere û radiweste. Ew çavên birçî ji awirên evîna qedexekirî, bi çend awirên evînî bariyan. "Ev çi çav in Xwedê?! Ji nêrîna yekemîn, mirovan dadiqurtînin". Ew nêrîn, di hestê Zinarê kurd de, her çû şax veda, her çû zemîn lê firehtir bû.

Kulîlk li serê şaxan ketin û bêhn vedan. Li xwarinpêjê, li gulîstana avahiyê, li çûn û hatina salonê... Ev bêhn belav bû. Ev xewn dewlemend bûn. Her roj silavê li hev didin û hestên xwe bi zimanekî şikestî, ji hev re radigîhin.

- Ez îro hetanî katjimêr çarê sibehê şiyar mam, ez nizamim çima? Zinar got: - Bawer bikî, ez jî her wisa mam, ez jî dikim û nakim, xew nakeve çavên min, lê mêrê min, mîna kevîrekî, ku tu bavêje binê bîrê, hetanî sibehê nalive.

Belê, Zinar dizanîbû ku tovên evînê, li ser şûveke beyar hatiye belavkirin. Ew tov, bi kenî û awiran tene avdan û şîn dibin, şaxên xwe li dilê Zinar û Svêta dipêçin. Herdu jî, newêrin ji hev re hestên xwe bînin zimên. Kur ji ber kultura xwe şerm dike, ku jin bi mêr e.

Li welatê Zinar, ev tækilî qedexeyê ye, tækiliya jina bi mêr, mirov li ser tene kuştin. Nav û rûmeta wî talan dike, dibe pizika ser zimanê civatê û hetanî dehê salan jî, nayên jibîrkirin. Nav û dengê malbatê wêran dibe û bêmamûsiyeke mezin bi xwe re tîne.

Svêta pêdivî bi gelek tiştan heye, alavên malê, nemreyeke telefonê, naskirina kolanên bajêr û hînkirina zimanê elmanî.... Di roja yekşemê de, divê biçe bazara azad, ya ku ji bo belengazan vedibe û alavên erzan û sivik, lê tèn firotin. Destûrê ji mêrê xwe dixwaze û bi Zinar re bi kolanan re diherike, li tirênên binerd û sererd siwar dibe. Lê mêrikê dinyadîtî, newêre kêlîkekê jî, xwe ji jinekê veqetîne, bawerîya wî bi kesî nayê, û bi taybet yê jî wan welatên ku ji her tiştî re birçî ne.

Mîna sitûneke hesinî, Zinar xwe xiste bin konê wê, her tişt sparte xwe, da ku dilê Svêta ber bi xwe ve bikşîne û wê ji xwe razî bike. Nizane ku, wê jî ev tişt berya wî, di serê xwe de nixumandîye, xwe di derya çavên wî de werkiyê, bê qeyik û gemî, li pêlan siwar bûye û di vevênîyê de serbest e. Lê naxwaze ya dilê xwe, ji Zinar re eşkere bike, bi kultura Zinar nizane.... Li hêviya rojan dimîne.

Du roj derbas nabin, ku doza dîtina hev nakin. Bi lez radihiştin telefonên xwe û bi (sms) an, nameyên kurt ji hev re dişînin, gazin û lomên bi şewat ji hev dikin. Dilên xwe dixistin çî. Bi dîtina hev, gelekî şad û bextewer dibin, û di wan hevdiştinan de destên hev bi germî diguvin.

Dara pêwendiyê, her diçe şax vedide. Kulîlkên sor, li serê şaxan ketin û bêhn vedan, rewş wisa derbas dibe, hetanî ku avahî hate girtin., Divê her hinek biçin cihekî din, gelo wê dîsa werin cem hev yan na?. Rojekê ji rojên zivistana europayî, ya ku bi berf û baranê tê xemilandin.

Zinar li odeya xwe rûniştaye, mîna hercar û şevên xerîbiyê dijmêrin. Li welatên ku tu girêdanê bi giyanê wî re çênake. Ax û ava van welatan, tîna dilê wî naşkîne. Êvar e.. bêdeqê li ser rûyê aso paldaye û bûye dema hijmartina kêlîkan û avjeniya hêviyan. Li der ve dengê pêlavên jinan tèn guh.. teq.. teq.. teq. Xirecîreke nû, li ber deriyê avahiya penaberan heye. Bixêrhatin û kenên ne ji dil, xwe li bêdegiya şevê dipêçe.

Di barkirinê de, alîkariya hev dikin û xatir bi awirên bi xemgîniyê pêçayî, ji hev dixwestin. Bi pêla baranê re, Svêta nema xwe girt û xwe avêt bin sîwana Zinar ya baranê, û kete ber sînga wî. Gulava evînê herdu giyan gêj kirin, her çûn nêzikî li hev kirin. Destê Svêta bêhimdî, li zenda Zinar hate badan, bi germaya dil, serma zivistanê şikandin.

Bi wan çend gotinên ku hîn bûbûn, her tişt eşkere hate diyarkirin. Ne kurdî û ne jî rusî, di nav axaftina wan re derbas dibûn, lê dîsa jî, gotinên wan bi alîkariya awiran, têra wan dikirin. Cara yekem bû, dema ku Zinar ji wê pîrsî: Tu ji min hez dikî?

Bi awirêkî fedyok, mîna keçekê ji keçên gundên Kurdistanê, bi çavîne şikestî û tije hêsir, serê xwe ber bi jor û jêr ve hejand, iniya xwe da ser milê Zinar û kesereke kûr kişand. Zinar nema bawer dikir, ku ew perda şermiyê bête hilanîn. Bi gotina ez jî re, lêvên xwe yên birçî û bi tîn, danîn ser hinarên rûyê wê yî sorgulî.

Bi ramîsaneke tenik ew pîroz kir, jina rûs di jiyana xwe de ev germî ne pelandibû, hîna ciwan bû mêrê wê mirîbû û bêçar mabû ku vî kalê por sipî bizewicîne, lê tîn bi kalo re nema bû.

Bi gihastina malê re, carê ku piştî mêrikê dikete wan, di bin çavan re, li hev dinêrin û bi lêvên xwe dimizicîn. Bi tewankirina kişandina alavan re, bi zimanê rûsî, ji mêrê xwe xwest, ku here û firvînekê ji dikana kolana bikire. Ne tiştêkî xweş e, ku Zinar ji mala me birçî derkeve, lê zinar ne birçiyê xwarinê ye, birçiyê dîtina Svêta ye.

Bi derketina mêrikê re, û tenahiya Zinar û Svêta re, dîwar hemî bi gotinên evînê derbûn. Her çûn nêzikî li hev kirin û ber bi hev de herikîn. Lê Svêta nedixwest ku gulîstana wê, ya tije gul û sosîn bi cara yekemîn re were talankirin, herdem ji maça dawî xwe diparast, geh bi soz û peymanan, û geh bi tirs û gazinan, Zinar ji ser sînga xwe veqetand, û ew sipart hêviyên paşerojê.

Rûyê wê, bû mîna kulîlkeke sor, dike bi xwînekê derbibe, ji layekî şermî û evîn, ji layê din ve, poşmanî û tîra ji eşkerekirinê. Gotina ku her li ser zimanê Svêta dîbare dibû: "Ez ne dikarim berdeyam bikim, ne jî dikarim jibîr bikim". Ev evîna yekemîn bû, piştî du mêrên Rûsî, yê ku tiştêkî ji dibistana awiran nexwendibûn, mîna pûtan bi wî hestê tenik re dan û standin dikirin, lê ew jî vevê carê mîna Zinar, di derya evîneke kûr de werbûbû.

Li wan welatan jin dil tenik û mêr xwînsar in, tîna wan jinan bi mêrên rojhilatî re dişkê û hat û bi wan re bê girêdan, her tiştî jibîr dikin, li cem wan tu sînor nehatine xêzkirin, dikarin di rûyê mêrên xwe de bibêje ez ji te hez nakim ji yekî din hez dikim, tu xwîn nayê rijandin, bi hêsanî çîroka wan dikare bi dawî bibe.

Her ji çend rojan carekê Zinar tê serdana wan, bi hatina Zinar re mêr ji hindur derdikeve û wan bi tenê dihêle, bi vevê rewşê bêhna Zinar teng dibe.

- Mêrê te naxwaze ez werim mala wî, lewma rûyê xwe ji min diguhere.

- Ma tu ji bo wî tê yan ji bo min? tu mêvanê min î û va ye ez bi erkê xwe radibim.

- Naxwe ku wisa be, ez jî dixwazim bi te re tenê bimîn, lê ez ditirsim ku bi ser me de bê û em ji hev nêzik bin.

- Na na ew dema ku tî li derî dixîne û dawiyê derbas dibe.

Van gotina serê Zinar werimand, mêrikê bêmamûsî dît, tîcarî tiştên wisa li cem xwe nedîtiye û ne bihîstiye, lê dîsa jî kêfa wî hat. Her ku ku Zinar dest davêt nava wê xwe dida alî û digot hîn zû ye, bêhna wê ji vevê pîrsê re gelekî fireh bû, lê ya zinar mîna ku agir di bin wî de hatiye dadan, tiştêkî nemabû ku bi zorê piştî wê deyne erde, mîna guran tîkeve ser goştê wê yê nerm, ji maçan pê ve tiştêkî nade, lê maç bi tenê jî dilê Zinar hênîk nakin.

Di wan kêlîkan de Zinar her tiştî jibîr dike, ziman, malbat, welat, û xwe jî jibîr dike bê niha li kû dijî. Agirê ketiyê nava Svêta jî gelekî gur bûye, lê tiştê ku nahêle Zinar xwe berdê nav bexçeyê wê, nexweşiya wê ya kezebê ye.

Newaf Mîro

newafmiro@gmx.de

Nêçîrvanê Kewa



Nêçîrvanê kewa ew çend salbûn ku ji cî û warê xwe dûrketibû. Di asoyê wî de nêçîra kewa û pêre jî bîrîkirina ax, av, ba û civata kurdevar dibû xewn û bîrîkirineke bêhesab û binî. Li dûrwariyê bi dîmenê kewê xwe, yê di qefesê de û yê kerê xwe, yê mezin kiribû raserê çavê xwe daliqandibû radiza. Gava serê xwe dida ser balifê çavê xwe digirtin li Kurdistanê bû. Lê serê siba gava çavê xwe vedikir dûrî her tiştî bû. Gava bala xwe dida derdorê xwe, û li xwe dinerî. Di nava xwe de, xweyê di nava xwe digeriya. Ew xwe yê di nava xwe de hew wî, ew xwe ya nasdikir. Jê fêhm dikir û jê jî hez dikir. Lê wî herî bêhtir bîrîya xwe yê, di nava xwe de dikir. Ew xweyê wî, bi xweyên xwe xwe bû. Bi kewên xwe. Bi kehr, hesp, pez, gul, kulîlk û bilbilên xwe, xweyekî pîrr cûda û rengîn bû. Bi stran, çîrok û ken û pêkenokên xwe, xwe bû.

Nêçîrvanê kewa, ji ber ku danûstendî wî bi derdorê wî re bi sînor bûn. Têgihîştina zimên û naskirina civaka Elman kêm bû. Lewma jî ew di cîhaneke cûda û yên derdorê wî jî, cîhana wan cûda bû. Wî xwe beyanî û bi tenê hisdikir, û wûsa bû.

Piştî salan nêçîrvanê kewa bi kelecaneke bê hempa û bi bermiradiyeke nayê hiskirin. Bi hêviya dîtina kewa û qebeqeba kewê re dil û giyanê xwe aşt bike berê xwe dabû welêt. Bawer nedikir ku dîsa wî warî bibîne, ji şabûna re hindik mabû baskên wî çê bibin û bi fire. Lê dem hatibû ku mirov karibe bê bask û per jî bifire. Nêçîrvan bi balefirê firiya bû, gava li balefirgehê bra, braziyên xwe ditibûn nikarîbû bi çavê xwe bawer bike, ku ew kes malbata wî ye. Piştî hevhemêzkirin û maça bra û brazî dixwestin wî li bajarê mezin bigerînin. Ji kêmanî de xwarineke bi hev re bixun. Lê wî qet, ger û seyrana bajara ne dixwest. Bi xwaza kêliyê berî kêliyê bigihîje cî û warê xwe. Gava li trîmbêlê siwar bûbûn berê xwe dabûn gund, Nêçîrvan dît di teyba trîmbêlê de dengê awazên tirkî belav dibe, wî got:

-Brazî ma kasetê te yên dengbêja nînin? Ka yeke Emo yê Xêlit, Ehmedê Cindo, Mamûdê Hesê, yan jî ya Baqî Xudo bide ser.

-Brazî got: Apo êdî tu kes guhdariya stranên wûsa nake. Xelk ji stranên Tarkan, Îbrahîm Tatîlses, Orhan Gencebay, Bulent Ersoy, Zekî Muren û yan jî yên Ahmet Kaya hez dike. Lê herî pîrr xelk ji stranên pop hez dike.

Niha kasetê te yên dengbêja nînin?

-Hene hew carcaran bavê min guhdariya stranên wûsa guhdarî dike. Ger mirov karibe ji wan re bêje stran!

-Ka tu bike teybê, yê din karê mine brazî! Gava brazî kasete Baqî Xudo xistê û her di dawîya awaza xwe de digot: weyloo ji kesere dilê dayika egîta re weyloo..

-Nêçîrvan demên xwe yên berê dianîn ber çavê xwe. Wî û brayê xwe li halê hev pirsîbûn, lê dawîya pîrsa zû hatibû. Û ya herî sosret ew bû ji bo wî, ku braziyên wî bi hev re tirkî diaxifîn. Bala xwe dabû wan bê pîrs û bersiv. Gava nêzikî gund dibûn, ji rêya asfaltkirî ber bi gund ve dageriyabûn, çavê wî lewha ku navê gund yê bi tirkî li ser, yê zingarî û ji guleyên çeka hezar qulî ketibû. Pêre jî dilê wî çar e çar lêdida. Lê bi nêzikbûnê kelecana wî kêmkir dibû.

Pêre jî ew "xwe" yê di hundirê wî de reng diguhert. Û wê xewna wî, weke darekê pelê xwe dadiweşandin.

-Çenko axê rengê xwe guhertibû. Kevira û nebata jî. Li derdorê gund ne keriyê peza û naxira dewara. Neji dengê ajal û balindeya. Tiştê li warê wî zêde bûbû stûnê elektîkê û zêdebûna aûtomobîla bû. Wa diyar bû êdî hatina trîmbêla ji bo zaroka jî ne balkêş bû. Dem û dewranê berê, zarok li pey trîmbêla dibûn ristîk û gulî. Û çavê gundiyan jî lêbû ka kî tê gund? Ya din jî, ew bû ku li gund mizgeft hatibû avakirin. Di nava axaftina xizmên wî de bûbû eyan, ku kes li gund nebe jî, bi teyba ku bang têde hatibû sazîkirin, her dan banga nimêjê dixwendin.

- Êvarî çend gundî yên xizmên wî hatibûn civata wî. Yan jî yên xizmên

wan li Elmanya. Nêçîrvanê kewa, çavê xwe li jin û mêrên zarşîrîn digeland. Lê wî li kê dipirsî, bersiva herî zêde "çûye rehmatê" yan "miriye". Yan jî wî li hemsalên xwe bipirsiya digotin; "hecî naçe civata" û yan jî "ketiye rêya xwedê" bû.

Êvarî dema civat geriyabû, piştî çend pîrs û galegalê ku bi kar û xebata wan ya cotkariyê pêve, çavê wan ketibû ekranê televîzyonê û li "dîzî" ango li Şow û rêzefilmên tirkî temaşe dikirin. Nêçîrvan bala xwe dayê ku, ew kêf û henek, klam û stranên dila û yên xweşmêra nemabûn. Ne dengbêj û neji çîrokbêj mabûn. Neji ew pêkenok û zalîkirina berê hebû. Televîzyona tirkî bûbû ewrekî reş û xwe bi ser civat û asoyê kurdevariye ve wergirtibû. Navê zarokan bûbû navê "tirkên xas" û kincên jin û mêra jî bûbû weke kincên anatoliya navîn û weke yên desthelatdarê tirkî. Ango serpeçayî! Nêçîrvanê kewa, bi hêvî û şabûna nêçîrê çûbû nav nivîna. Serê sibê, hê malî razayibûn ew rabûbû û berê xwe dabû nav gelî û zinaran. Lê bala xwe dida derdor, ne wî ew bêhn û bayê berê hisdikir. Neji kovalê mara! Ne pîrrîna çivîka. Ne sîxur û neji kêvroşkên qelac û zozana mabûn. Wî çiqas bala xwe dida ku Tîtiyekî bibîne û dengê tîfî bê guhê wî.

Ku wî ji xwe re weke bilbilê Kurdistanê binav dikir. Nikarîbû bawer bikirina ku Tîfî û Çikçikan nînin! Ew çiqas dûr diçû jî wî ne deng û pêjna kewa û neji ya sîsik didît. Gava xwe berdabû zikê çem jî, ne beq û neji reqên xwe diavêjin avê ditibûn. Li ber perê avê ne darê dirikê û neji yê şirtê hebûn. Ne kalîna miya û neji dengê bilûr û awazê şivana hebû. Wî êdî cotariyê ga û hespa jibîr kiribûn.

Dengê kurtekurta traktora û pêjan mirova ji gund belav dibû. Û helbet yê banga mellê ji teybê.. Lê Nêçîrvan bi hêviyeke mezin tîrêjê rojê silavkir.

Lê wî bi ronkaya rojê re dît ku êdî ne kerbeş û qîfarê kerbeşê. Neji Tolik, Pîvonk-şinêrek, Sîping, Gûriz, Axandir neji Dobelan li vî erdî mane. Wûsa hisdikir ku kevir, ax, av û ba jî xwe guhertiye. Êdî her tişt kal û pîr bûye. Xecxecok û beybûnê li qelaca şîndibûn jî nemabûn yan jî pîrr kêmkir bûbûn. Wî bala xwe dida derdor ku naxira gund û kehrê li derdora gunda diçeriyên bibîne, nedidît. Û neji borîn û zirîna wan dibihîst. Wî dixwest dengê awazên delalê keçika ji dengê keç û bûkan bibihîze, lê weke ku binax bûbe deng ji axê dihat û derdor nedihat. Hew dengê radyoya ku stranên tirkî digot ji dûr ve dihat guhê wî. Nêçîrvanê kewa her çiqasî bi dûrve diçû ew çend hêviya wî kêmkir dibû. Ew dem û dewranê wî yên berê dihatine ber çavê wî kelagrî di dil û hinavê wî de di ser hev re diqelibîn. Wî her çavê xwe li lawirên kûvî digeland. Lê êdî ew qeliya bûn. Heta rastî nivîsekê hatibû ku li ser lewhê nivîsîbûn "Askerî bölgeye gîrmek yasaktir! Ango "devera Leşkeriye, ketin qedexe ye. Nêzikî nivîsê rûnişt û kelagrî dibû. Di wê kêliyê de braziyê wî hatibû. Brazî matmayî ji mamê xwe re gotibû; Tu li vir çî dikî tê serê me tîkî teşqelê apo! Ka vegere. Gava berê xwe dabûn malê braziyê wî gotibû;

- Mamo nayê bîra min, ku li van deveran kew hebûn, tenê Sîsik hebûn, niha ew jî qeliyan. Xelkê di dema hêka de hêkê wan dixwarin. Gava çêlik jî derdixistin ew û çêlikên wan jî dikuştin û dixwarin. Beriya çend salan qitik û bet jî hebûn, lê niha ew jî neman.! Berê Şalûr jî hebûn niha ew jî nînin. Kal û pîrr qala gelek tiştan dikin ku îro mirov nikare wan di xewnana de jî bibîne. Qala keriyê xezala û hirç û gura jî dikin...

Brazê her dipeyivî û Nêçîrvan jî ji xwe re dihizirî... di ber xwe de got; Raste brazî, pêşiya gotiye.. War ev ware, lê bihar ne ew bihare!

Gava ji dûrve li gund temaşe dikir û bala xwe dida gund. Deng û pêjna ji gund dihat bi wî xerîb û nenas bû. Wî xwe xerîb û xweşîm hisdikir. Lewma jî wî êdî bîrîya xwe û Elmanya xwe dikir êdî.

Eskerê BOYÎK

QAFREŞ



Baharê dîsa deşt, çiya û banî hemêz kirin. Hêşnayê erd pêça. Koçera berê xwe dane zozana.

Hesoyê şivan jî koça xwe li ga, hesp û guhdîrêja bar kir, berê sewalê xwe da çiyayên bilind, Elegeza rengîn.

Berî koç rêkeve Heso çû, li ser kevirê ber holka Qafreş, seyê xweyî pîr rûnîşt, serê Qafreş hemêz kir, cixare vexist, melûl piştê sê tîmar kir.

-Qafreş, birayê minî amin, tê min biborînî... Emekê te çiqas bêjî li ser min heye. Me rojê dijwer tev derbas kirin e. Em nava berf, bager, şeverreşa, gur û dizara derbaz bûne. Tu wek şêra tim piştê min bûyî. Piştê min teda germ bû. Lê îro ez ber te dikivim, birê min. Îsal ji xwera vira ber malê rehetbe. Ez malê dispêrme te. Apê minî Bedo jî mîna te extyar e, ew jî êdî nikare bê zozana. Ew jî ber mala xweye. Xwerina te li ser wîye. Ew te birçî nahêle. Teyaxke birê min, heta payîzê em bi xêr vedigerin.

Qafreş bi çavê melûl xweyê xwe dinhêrî. Teyê bigota fikira wî texnîn dikir, serê xwe danîbû li ser çoka xweyî û bi hisret li riya koçê û çiya dinhêrî...

-De xatirê te birê min,-Heso dîsa serê Qafreş tîmar kir, rabû û pey koçê lezand.

Qafreş pîr bûbû. newqê wî ketibûn hev. Diwestya. Çavê wî şêlû bûbûn, pak nedidîtin. Şivanê sereza rind zanibû ku Qafreş yê berê nîne, qewat laşê wî da nemaye, lepelep lê tê êdî nikare qewlên çiyayê dijwer û berk da teyaxke. Seyê şivana wê wî bixeniqîn, li zozana wê perîşan be, Loma ew biryar da...

-Wa wê başbe, him wîjdanê minê rehetbe, him jî qelsbûna Qafreş bi çavê xwe navînim...

Dema koçer berê xwe didine zozana, şabûneke xezayî dikeve dilê wan, tê bêjî eyd e, dewat e... Qerebalixa ken, henek-laqirdîyên kevanî, zilam, keç û bûkan, dengê zarokan, hore-hora şivan-gavanan, berebera pêz, gişk tevî hev dibe û koçêrara hildikşe berbi zozana.

Wê rojê Heso melûl bû, kerr li pey koçê dimeşya. Ewî tirê tiştêkî xwe wunda kirye. Valayîk dilê wîda çê bûbû. Seyê din dora koçê diçûn dihatin, lê cîyê Qafreş dihatê xanê...

-Rast dibêjin, xwezî mirin hebûya, kalbûn-pîrbûn tunebûya,- Heso keser dikşand,- kê çi dikare bike? Qirara Xwedêye...

Hersal Qafreş, seyê din, di dora xwe kom dikirin, dora koçê diçûn-dihatin, çavê wan der dora. Hewasa Heso bi wan ra dihat... Sî jî li ber koçê û kerê peze wîra derbas bûya, Qafreş zanibû. Wî û Qafreş ji hev fem dikirin...

Heftêk bû koçê dewsa warê xwe danîbû. Konên reş li pala çiyê wek reşêla melisîbûn. Binatara kona guherên sewalên wan bûn. Jîyana obê riya xweda dimeşya.

Hewa xweş bû. Palê çiyê, gelî -geboz bi renga xemilî bûn.

Wê berbangê wek her berbangê zozana, kevanî, keç-bûk, şivan, gavan hilşyabûne nava guhera, pez û çêlek didotin, berx û golik berî makê wan didan. Berrîna mîya û berxa, orrîna çêlek û golika, qerebalixa ken û laqirdîyên zozanvane, dengêkî usa kiribûne wur, ku kesî dengê hev nedibihîst.

Heso, emrê xwe li nav çiya, bi şivantyê derbas kiribî. Hînî wê qerebalixa berbangê bûbû. Kêfa wî ji wê çûyîn-hatinêra dihat. Wî jî laqirdî dikir, dikenya. Zanibû demêk şûnda ew dengê biseqire. Kerê pêz û naxirê dêwêr wê berê xwe bidine mîrg û çimanên gelî-gebozan. Kevanyê keç û bûka bidine dû xwe, beroşê şîr hildin bilezînine kona, dûyê kuçika wê berbi esmên bilind be.

Ewê jî tenê kêrî bajo çêrê û heta êvarê tenê, xwe bi xwera, kevir-kuçikê çiyêra biaxive... Bere Qafreş tim kêleka wî bû. Qafreş ra diaxivî. Qafreş ew fem dikir... Qafreş ew tenê hîşt.

Heta zozanvan karê xweva mijûl bûn, wî jî beroşa laka sa hilda, ji guherê derket, ku sa têrke... Lê nişkêva, bêhemdî xwe, cîyê xwe da sekinî, rê nihêrî, qeretûkî sa, dihejya û hêdî-hêdî berbi guherê dihat. Heso Qafreş nas kir. Teyê bigota qalibê Qafreşê bêruh, bi çavê şêlû, bê hêz, fesal ku nekeve ancaxî lingê xwe pêşda davît, hêdî-hêdî dihat. Newq ketibûn hev, pûrta wî qirêj û vegevîzî bû, dêla xwe erdêra dikşand. Se, bi teherekî xwe gihande Heso, bêtaqet dirêjî ber piyê wî bû.

Şivên ji cîyê xwe banz da, kulavê xweyî şivantyê raxist, laşê Qafreş kişande ser û serê sê henêz kir. Heta wî hebû li zozanvanê guherê kire gazî:

-Beroşekê tije şîrkin, bînin, Qafreş hatye, Qafreş! Qafreş birçîye, Qafreş westyaye...

Hazira gava navê Qafreş bihîstin bêrî hîştin, dora Heso û Qafreş civyan...

Heso laşê seyê bêtaqet tîmar dikir û hêsir ji çava dibarîn:

-Qafreş, birayê min, çima wa bûyî? Birîn ser te hene, seyê şivana neheqî te kirine. Han şîr buxwe! Tu birçîyî. Bixwe, birê min, bira ruh teda bê...

Sê şîr nexwer, çavê wî req bûbûn çiya, guhera, koçera, obê, kona dinhêrî...

-Ez ji te fem dikim, bira. Te bêyî çiya, bêyî van zozana, bêyî me teyax nekir... Tu hatî ku tevî axa çiyayên xwe bî, vir bimînî...

Heso destê xwe da ser çavê sê. Serê wî req bû, çavê êdî venebûn...

Arşek Baravî

arshekbaravi@gmail.com

Mirin



Dilê min pêkolyê dike...

Ji xewna xêwê mirinê bi tirse...

Keftelefte.. kêferate..

Dem hate...

Mirî azade.. û azadiyê dixwaze...

Qad û kolanên gorrê..tengin,

Ne xwpêşandan,ne çalakî..

Û ne pêşangeh..

Di gorra moriyan de.. ne li darin...

Mirin bindeste, gorr setemkarin..

Hezkerên komkujiyê gunehkarin..

Her ku gullan dibarînin..

Tîpên min dikujin..

Her ku topan berdidin..

Destana helbest, pexşan û bîrtengan ..

Bi girî vedikin...

Tew ku balafiran difirînin..

Mirî bi ciwanan şa dikin..

Warê pênuş û lînuşan wêran dikin..

Heke ku bixwazin zimanê min bişkînin..

Û helbestê lal bikin,

Ew jin û mendalan..

Di paxila Yezdan de.. dikujin...

Azadî ..şoreşe..

Azadî çî qandî xweşe..

Ew talan bûye,ew hatiye dizîn,

Lê navê wê ..

Bi xwîne hatiye nivîsîn,

Ew her û her geşe...

Nikarin vê watê ji ferhengên hilînin,

Nikarin wê bi çaksaziyê biguherînin...

Ku ew sernûçan bikujin..

Emê nûçe û saloxên nû wergerînin...

Ku ew rojnameyan qedexê bikin,bişewitînin..

Emê di dilên xwe de vejînin...

Ku ew telefizyon û malperan dapoş bikin..

Nikarin qîrra serhildêr û pakrewanan..

Bi tîrêjên rojê re..

Ji ser me vegeerînin...

Yekîtiya gellê min birîn dikin,

Wê jî bi pîlanan diqewrînin,

Lawaz dikin.. da bimirînin,

Em qurbanin.. em gorîne..,

Lê nikarin..

Tovê wê qirr bikin û biqelînin..

Em jî dîsan û dîsan wê diçînin..

Da ku ber bigire û ew neçar bimînin..

Ew ne hermane,

Lê kurdên azadîxwaz.. dê her û her bimînin.

Pênûsa min îro

Serhan Isa

serhanisa@hotmail.com



Kasipêriyên neqşên mirinê

Bi bînekê û du bîstikan,
berî Kum û Kolos¹ ê Kalikê min,
yê di xwihdanê de mayî,
yê ku sorek ji sorên mêraniya wî bû,
yê ku xweşiktirîn rengê reseniya wî bû,
yê ku serxêlê kurdayetiya wî bû,
yê ku nixuriyê êşa wî bû,
û di rûberê dawî de
yê ber bi mirina zer,
li qubletî Odeya wî,
ya ji pêjina du sînoran,
ya xwekirinê pêjna "Selîm ê Êsif ê Haco"
pêrgî "Sivikê pedşayî¹" hatim,
li wir,
mîna şelîpanek mêşên hêngiv,
şeliyam pêşiya wî,
bi zengelorka xwe ya dûdayî ve,
bi kerika guhê wî ya dirêj ve
bi hewa ketim,
û jê re got:
babo, Babe Derêwş¹
şerînê Xwedê,
min bi "Kulik û Xirqeyê Qîxadî¹" xwe avêtiya te,
tenê hema bînekê û du bîstikan,
ji xêlê kum û kolosê kalikê min re,
ji kenarê vê dema xwe ya har,

¹ Kumeke ku ji kulav (Hîrî) tê qekirin, û tenê Kurd deynin ser serê xwe, û li dora wê emawiyê re e.

² Melek Cibraîl e, serokê Milyaketa

³ Qikestiyê xwedê, lê li vir bi wateya Cibraîl hatiye

⁴ Kulik kum e ji hiriye te qekirin, u xirqe Qutike (êlek) ew jî ji hiriye te qekirin u bi ava gwîzê tê qekirin û bi ava kaniya sipî li (Lali) tê muhrkirin, û mîna Feqîran li nav Êzdiyan li ber xwe dikin (Qikestiyên xwedê ne)

bike mizgîniya vê xatirxwestina bêqidoş babo.

De baş e,
ez ê nîvsebilêkî û du ta dû xwe ragirim,
paşê ez ê biqor im ha,
wisa ew î Sivikê Xwedê,
yê tenê sehû û sir,
yê tenê sipîbayekî Tîr
gavek, ji pêxê kevîterkekên hebûna xwe,
ya tenê Sir serbijêrî ew ê hêvînameyê kir.

Dibin kujikê lihêfa xwe ya rûtenik de,
kalikê min,
yê ji pêjna du xatûn û çar bira mayî,
li min qulift û wiha bi ser min ê bêqeram de zûriya:
kurê min:
were,
de were
em ê vê lata axaftinê hûr hûr bihêrin
û kûr bidêrin,
de were teniştî min,
ez mistek axaftinê bi qiloç,
berdim besta destê te.

li min qulift û wiha bi ser min ê bêqeram de zûriya:
kurê min:
were,
de were
em ê vê lata axaftinê hûr hûr bihêrin
û kûr bidêrin,
de were teniştî min,
ez mistek axaftinê bi qiloç,
berdim besta destê te.

Biner lawê min
Dibêjin: wê rojekê "Girê Qilik¹" çê bibe
"yê ku herê ser poşman e
Û yê neçê dil covan e"
De îcar ez ji berxê xwe re bêjim,
hayî ji xwe hebin

hun di garana van gundên li hewa de
hunda nebin,
hun di garana van bajarên bêjî de
xwe jibîr nekin,
gêsinên xwe li ser seda nehêlin,
û bi ser zêr û zeger malê dinê
û tu kelax û paşilên direhayî de noq nebin,
erê kurê min,
û biner,
hun Kum û Kolosê min,
di tu aravan de neşwin,
nedin serê tu zindiyan
û nedin destê tu rêwîyan,
erê kurê min,
kum û kolosê min

yê ji şifqa, Igal, rî û simbêl û hemî nîşanan
sortir

biner ez ji lawê xwe re bêjim,
gereke tu destpêkê ji qiloçan ve bigrê
û qiloç jî kurê min,
tenê di destên mêrên bi Kum û Kolos de
dihedinin lawê min

biner,
ez ji rêwiyê xwe re bêjim,
şevên xerîbiyê,
devjihev in
mêran dicûn,
jinan ditalêsin,
zarokan dimijin,
şev in dev tîrş in,
kewitîne,
mêne,
kur in,
kol in,
beş in,
kurê min,
hema te dîq kir
û kire nirçe nirç
wê te

di xwede bikin pêjin ha...
biner...

hayedar be ji xwe,
her timî diranên wan,
sipî û qîç in,
û wek zebênîyan,
li ber,
axaftinê veketî ne,
lawê min.

Jinên wan,
erê kurê min,
pirê wan
tilî gumr in,
dev şor in
bejin kal in.

Mêrên wan jî,
tilî nerm,
û bê sehû û sir in.

Min guhê xwe yê sincirî
Ji ser devê wî yê mîna tenûreka himhimî
rakir,

û bi kevîkên lêvên xwe yê mitaldayî
di deşta guhê wî yê paldayî de got:
Erê babo

Erê bila,
lê em ji te hez dikin,
gund û bajar,
Çol û Tor,
Dêr û Mizgeft,
sorê Minareya te
keskê destên te
nas dikin babo.

Babo Aferîn,
Aferîn ji sipî sorên te re,
Aferîn ji kum û kolosên te re
Aferîn ji nevî û nevîçirkên te re
Aferîn ku te em avêtin
ser pişka tayê bi tenê
û tayê bi tenê jî babo
çarika "pîra fata¹"
nixuriyê kum û kolosaye babo.

Ku kurê min,
terqên ji tava mirinê hat,
wê nuha hun, bajar, gund,
û ev xelkên peyv hiltepilî
ji min ciz bibin kurê min
darên ku ji sîka min hez dikirin
nema careke din ter dibin,
ew avzêmkên
ku ez mîna heyvê
di zengelorkên wan de der dibûn
wê xwe vexwin,
wê her tişt xilmaş û hêmin bibe,
kurê min gerdûn teng bûye,
û bayê wê ez bînefirşkî kirim,
sibehên wê tije qereçî û muxlacî¹ ne
navrojên wê nîv parsek û gewî ne
şevên wê jî bejnên daleqehî ne kurê min
gerdûn ji roja roj ve bi baye,
û ciyografiya jî
di destên bêjiya de ye
kurê min
ev dema şehitî
ne dema Kum û Kolosaye
hema mîna kîfroşkek têrbuhar van belqitiyan
ji pişt xwe ve
ji pêşiya xwe ve
ji paşla xwe
ji kêlekên xwe
di welidîne.

kurê min,
lê jibîr neke
li ber dîwarê rojava yê Oda min,
ya ku hîna
bîna du sînoran
jê difûre
her roj,
piştî diwa sibehê
kum û kolosê min
deyne ser çoka xwe ya rastê

AZAD RAMADAN

aand2011@gmail.com

**Xewkam ney lê lê dînê**

Xewkam neyê lê lê dînê ti wî jiyânî ti evînî
 Ti melhema ser birînî dil dermanke lê lê dînê
 Ji xewrê dil dinalim rondik ji çavê di barin
 Ger li cemê ti rûnenî şekir nekê nav wî kenî
 Bi gorî û bi ezbanî dîtna çava bo min çikê
 Ger tu rehmê li min nekê evî dilî tu şanekê
 Wî dilêxwe ji mir nevekê niviştê mela bo min çikê
 Ger tu ne yaramibê xenim û ber malya mi bê
 Ti ne evîn û jiyanamibê wê keckê xelkê bo min çikê
 Heger hero te nabînim ramûsankê ji te nestînim
 Ji wan liva mey ne vexwum ma xeyal û sûret bo min çikê
 Behr û çiya ez di birim herdem ez li te digirim
 Li ser te va ez dimirim bi dêrbûnê ma ezê çikim

Lawîn Şexo**Firmêsk**

Were li nav gera şepol a astengên min
 bibe mêvan
 Pencer a derya janan veke û
 perdê ji ser bide alî
 Xemgîniya xwe
 bispêre hejariya min
 û xewnên evîndarekî xembar
 ji dil re bixwîne
 Rastî hêviyên min were
 Lê
 Dergûş a hêlankirin a helbestên
 min nelivîne
 Sêrî giryan û qîrîn û hawarên
 min bike
 Lê
 Ristik a rêzên firmêskên min
 li gerdên a xwe negerîne
 Bibe agir bibe ba û babîsok û toz
 Bibe av bibe qeşa bibe berf û baran û bahoz
 Lê
 Dûrî mêwên rez ê jiyana min here .

**Mihemed Cezawîr
Hemkoçero****HEYV Û ROJ**

Heyv û rojê li ezmana
 Didin xwe pesn û tajana
 Her yek dibêje ji wana
 Ez im dîlbera ciwana

Herdu ji hev dexisî ne
 Li hember hev kerisî ne
 Ji erdê re verêsî ne
 Li sitêrkan vebrusîne

Du rojgar in li jiyane
 Kesek derdê wan nizanê
 Li tariya zivistanê
 Winda dibin ji baranê

Buharê li hev dibanin
 Rengê gul û bilbilan in
 Hem rewşena van rojan in
 Hem jî ronîya şevan in

Geh jiyane dixemlînin
 Bi hev re wek Mem û Zîn in
 Geh jî perdan diqetînin
 Bi mehan hevdu nabînin

Hêv dibê: Ez pir delal im
 Dîm ji sêv û rû bi xal im
 Ne pîr im, ne jî navsal im
 Lê li hember te dinalim

Tu tîrêja xwe davêjî
 Min ji xwe re dihevojî
 Gotinek xweş tu nabêjî
 Bi rengê xwe min disojî

Çavan dikî min fedokê
 Nabe mêvan li min rokê
 Dilê xwe li berbirokê
 Ne li gul û xexecokê

Êdî bes e ne nihêre
 Min ji çavêd xwe veşêre
 Dilê min ji kulan têr e
 Min nexa nav pêt û êr e

Roj dibê: Ez bi te dîn im
 Dildarekî dil xemîn im
 Hêmin û geh jî gergîn im
 Hem payîz û hem havîn im

Tu tenê derdê min zanî
 Bi jana min re hêvanî
 Wer hêdî bike vî canî
 Ey delala esîmanî

Li hember te xwe dibînim
 Ji dûrbûna te bi tîn im
 Gava ku ez te nebînim
 Xwe bi xwe ez disuhtînim

Tu naz û niyaza minî
 Tu qaz û perwaza minî
 Razeya awazên minî
 Miraz û daxwaza minî.

Pênûsa min îro

u
 destek qehwe,
 birjîne ber serê sibehê lawê min,
 û nuha,
 ku tu çûyî bajêr,
 ew cawfiroşê,
 tara Odê¹
 dostê min e,
 ew nuha darbestan jî çê dikê,
 silavên dostaniyê lêke,
 û jê re bêje :
 têra çend rihan,
 û çend gurz ronahî,
 bila ber serê min çar tiliyan dirêj be
 û kêleka min ya çepê jî bostekê fereh be.

kalikê min,
 berî ku rûberê şevê yê dawî biqetîne
 bi seğurkê re
 di henteşa wê seqema zer de
 wisa ev mista axaftinên bi qiloç
 rokire destên min yên qeşagirtî
 û....
 sê caran,
 Kum û kolosê xwe,
 ber bi jor kir,
 li ser çoka min ediland
 bi destê "Sivikê Pedşayî" girt
 û wek du tîrêjan,
 ber bi desta mirinê ve vezîlihan

Hekîm Ehmed**DEST**

Kê gotiye tu nabîni ?
 na..ez li çavên te nagerim
 riwê xwe jî rengîn nakim
 tu.. tu yî..
 ez te nas dikim..
 tu.. çavên xwe yî
 jimarînkê xwe yî
 ne berê.. ne îro..
 û ne jî sibe..
 tu şaş nabî
 ezê bimînim zaroka teya delalî
 waneyên perîşaniyê ji dest te digrim
 bi serê min û çavê min de
 derya dilovaniya xwe..
 rûdike
 û ez..
 ne bi kêfa zimanê xwe
 ziravê xwe şêrîn dibînim
 eve bêrîkirina min
 weke min..
 bê rege
 di gewriya min de
 di xwîna min de dimîne
 rojekê min di nav çavên te de qîr kir
 çavên te deng dibihîzin..
 belê dibihîzin
 Ez li çavên te nagerim
 riwê xwe jî rengîn nakim
 bese ku tu...
 li virî..li wirî..wêda ha yî
 ezê tenê bigerim .. bakim..
 destê te
 waaaa destê te yê av..
 û tiliyên te yên sur.

“Keştiya Penaberan”

Çawa bi rê ket?

Arşevê Oskan

Ji weşanên Do, 2010

Roman ji bergê ta bi bergê 111 rûpel e, û bêtir tenê romanê ber bi dawî ve dajo, tenê beşê dawî Keştî ya ku penaberan hembêz dike, dibe bêjer û dayik. Dibe dayika penaber û zarokên serhişk.

Bi gumana min, eger bêjer di romanê de pir dibin, roman jî xurt û bihêz dibin, li vir dikarin mînakê baş û nêzîk bînin bîra xwendevanan, ku ew jî mînak Helîm Yûsiv e “Gava Ku Masî Tî Dibin”. H. Yûsiv gelek bêjeran bikar tîne, geh ew, geh kevir, kum, seh, derî û tiştin din dibin bêjer û roman rengî dibe.

Gava ku gelek bêjer romanê vedibêjin, her bêjerek bi bêhn, giyan û şeweyê xwe vegotina romanê bi xwendevanan şêrî dibe. Jixwe ku xwendevan ji romanê hez kir, bi romanê ve hate girêdan û ta ku wê bi dawî neyê nema dest ji xwendina wê berde, naxwe nivîskarê romanê serkeftî ye û dikare îca roman in din ên serkeftî binivêse.

Arşevê Oskan helbestvan e, bi nivîsandina helbestê navdar e, ta ana “Hêviyên Birîndar”, “Kê gul çîni”, “Berbang Qedexê ye” û “Xewnistan” hatine çap kirin. Di “Keştîya Penaberan” de ku roman û tecrubeya nivîskar a yekemîn e bi pexşanê re, lê dîsa jî nivîskar romanê bi helbestê dixemilîne. Mirov dikare bêje ku beşê dawî ji romanê “Keştî jî koç dike” hema hema hemû helbest e lê bi şeweyê pexşanê hatiye nivîsandin. Di romanê de giyanê helbestê wek çûkekî penaber tim amade ye, nimûne jî gelek in;

Navnîşanên hemû beşan; -stûnên derizî di bin asoyên mijê de-karwanê rênediyar-Nûzenûza êşên di kûrahiya de asêbûyî-şevên tîr li ser dilan tene raxistin-Vedenga janên welêt li kolanên biyaniyê dijenin-

“Da ku li ser dilê wî, ev xem êdî neçêrin(R83).

Her sibeh, pencere tîn vekirin û bêhna asoyê buharê, hemû bêhnan dişo(R85).

Ez nizanim dê nivîskar nivîsandina romanê berdewam bike yan na, lê ji bo min ku romana “Keştîya Penaberan” 222 rûpel baya, û nivîskar çarenûsa penaberiyê bi wê wataya wê ya hişk û zuha bi dawî anîba, yan jî wek mînak ku Bedo yan jî Miho wek kesê sereke di romanê de bikar anîba û derd û êşên penaberiyê bi riya wî û kesên li der û dora wî bida nasîn dê romanê bêhtir êş û şikestinên penaberan di “Keştîya Penaberan” de bi me bida nasîn û encama daba. Mirov têdigêje ku Keştî lehenga sereke ye, ji ber ku ew dayika hemû penaberan e, wek ku di beşê dawî de li ser zimanê keştîyê tê gotin. Ji hêla din ve, mirov dibîne ku çarenûsa wan kesên di romanê de nediyar e, tenê di beşê dawî de keştî wek bêjer dibêje: “doh Sara xatir ji hemû hevalên xwe xwest, lê ji min nexwest û bar kir. Berî çend roja Elo jî bi destê jina xwe ya belengaz girt û ew jî çû, lê nizanim pir li dora xwe dinerî wekî ku nedixwest kes bi cihê wî ye nû zanibe. Îro jî ez dibînim ku Miho û Bedo jî destê alîkariyê dirêjî Heno dikin û alavên wî didin ser hev”(R109). Nivîskar bi van hevokan xwestiyê çarenûsa hin kesayetiyan romanê diyar bike, wek ku nivîskar xwestiyê jiyana wan bispêre pêşerojê nediyar.

Bi gumana min, eger nivîskar piçekî din xwe biwestanda û çarenûsa penaberan a piştî “Keştîya Penaberan” birista dê roman serkeftî baya. Bi min nivîskar dikarîbû bi şeweyê romanê biranînên penaberên “Keştîya Penaberan” binivîsîne, yan jî jiyana û xirabî her sê mehên di keştîyê de. Dibe ku nivîskar bi qestî nexwestibe çarenûsa wan a piştî keştîyê diyar bike, çimkî hemû penaber di kolanên xerîbiyê de winda dibin. Di romanê de diyar nabe bê nivîskar kîjan kesayetiya romanê ye, lê ji bilî beşê dawî ew bêjer e, di beşê dawî de nivîskar keştîyê dike bêjerê romanê. Bi gumana min li dawîya romanê nivîskar agahdar dibe, ku di romana qels de nivîskar dibe bêjer, û ji ber wê yekê di beşê dawî de keştîyê dike bêjer, îca çî bêjer; dayika penaberan û zarokên serhişk.

Nivîskarê romanê bi wêrekî dest davêje hin mijarên girîng, rexneyan dike, û nerazîbûna xwe wek helwest diyar dike. Gelek caran pê li sînoran dike û mîna çûkekî azad difire û diçe li meydanên azad dideyne, daku wan mijaran bi azadî vebêje û hinan jî rexne bike. Mînak gelek in.

Mînak 01

[“Hûn kurd in?

Na em êzîdî ne bira

Ez dizanim keko hûn bi ola xwe êzîdî ne, lê bi netewa xwe ma hûn ne kurd in?

Na heyran em êzîdî ne, em nakevin partiyan, ji bo xwedê durrî me here”]. (R 76-77).

Mînak 02


Kondomek bi diranê xwe vekir û li mêrikê wî siwar kir. Ev cara yekê bû ku Îbo bi kondom wî karî dike û li jinan siwar dibe.(64)

Mînak 03

Bi kurdiyeke lawaz çend pirs jê kirin, wê kurdiya lawaz Bedo pir aciz dikir, ji ber ku kurdên bakur ku dighaştin hev, zimanê wan tenê bi tirkî bû, qet bîra zimanê kurdî nedibirin. Ji vê sedemê, zimanê wî hevalî giran bûbû.(R70).

Mînak 04

Li cem partyên me hîna tiştê zelal nebûye û xwe ji tiştê re jî amade nekirine, xwe wekî çêlikên vê hikûmetê dibînin û hîna bi navê welatparêziya Sûriyê



dikin. Wê ji xwe re wek erkekî pîroz dibînin, haya wan ji bayê felekê tune ye. Tim jî, dilê gel dixin cî û wî bi xeterê agahdar nakin. Tenê karê ku dikin, ji bo ku hev li derewê biqelibînin, ji ber ku her yekî, yê din perçewerçe kiriye û her sê partî bi navekî tên naskirin.(R89)

Gelek mînakên wisa di romanê de derbas dibin, mirov fam dike ku nivîskar di hinan de dixwaze rexneyan li civaka wan kesan bike. Di mînakê yekemîn de nivîskar xwestiyê rexneyê li êzîdiyan bigre û bêje ku hûn berî êzîdî bin hûn kurd in lê êzîdî wê red dikin û bi îsrar dibêjin na em êzîdî ne, ango kurd û êzîdî ji hev cuda ne û rojekê dê êzîdî ji kurdan veqetin û bêjin em û hûn ne bira û ne jî ji yek binyadê ne, em ji hev cuda ne. Nivîskar eşkere xwestiyê rexneyê li wan kesên ku wisa diramin, bike.

Di mînakê duyemîn de, jixwe gelek mînakên wisa di romanê de peyda dibin. Bi van mînan nivîskar xwestiyê kesayetiyan xwe eşkere bide diyar kirin, rastiya wan diyar bike, bi gumana min hin sînor jî tên derbas kirin, bila di romanê jî de be, lê dîsa jî wêrekî ye.

Di mînakê sêyemîn de, wek ku di gotarên xwe de jî gelek caran nivîskar xwestiyê rexneyê li kurdên bakur bigre û bêje: şerm e hûn bi hev re bi tirkî diaxivin, du kurdên ji bakur li ku dighên ba hev awtomatîk bi tirkî bi hev re diaxivin, û hîna dibêjin tirk nahêlin em bi zimanê xwe biaxivin. Li Europa tirk ne li ser serê we ne ku hûn bi tirkî diaxivin”tirkbûna kurdên bakur li Europa ne sûc û gunehê tirkan e”(A.O).

Di mînakê çaremîn de, nivîskar helwesta xwe li dijî perçebûn û lawaziya partî û tevgera kurdên rojava, eşkere dike. Û wek berpirsariyêke dîrokî tîne ziman ku ev ne tevgera ku ji bo hevî û xwestekên miletekî karê rizgarîxaziyê bike, ew tevger û partî gelekî lawaz in.

Kesayetiyan romanê di nava sê mehan de jiyanneke nû ku qet ne mîna ya welêt e dijîn. Li Elmanya, di keştîyê de wek ku gerek bibe nivîskar kesayetiyan romanê dilivîne, çîrok û çîvanok, bûyer û serpêhatiyên wan vedibêje, karekera wan derdixîne. Mirovên di romanê de mînakên zindî ne ji hemû penaberan re. Sara û Cîhana Duhokî wek du jinan, nimûneya du jinan diyar dibin. Sara kêfa xwe bi xortan re dike û Cîhan xwe diparêze daku nehetike û biçê bi destgirtiyê xwe yê li Bremen re bizewice. Arasê Kerkûkî ku hevalê Ensar Al Islam e mîna sofî û oldarekî tevdigere, nivîskar jî bêguman dê wî wek terorîstekî diyar bike. Di romanê de, hema hema di her beşê de kesayetiyan nû, çîrok û serpêhatiyên nû derdixevin û nivîskar wî beşê romanê bi wan re bi dawî tîne. Bi giştî nivîskar xwestiyê ku kesên di romanê de wêneyekî giştî yê penaberiyê di keştîya penaberan de diyar bike, ango ew kes dikarin rojane li kampên penaberan bîn dîtin.

Penaber ji ber gelek sedeman ji hembêza dayika xwe, ji welatê xwe direvin û berê xwe didin xerîbiya mal wêran. Di tûrikê her penaberekî de çîrokek heye. Di beşê “Vedenga janên welêt li kolanên biyaniyê dijenin” nivîskar wek bêjer diçe Qamişlo û dibe şahidê serhildana 12ê adarê û kuştina Ferhad. Mirov guman dike ku di dûv re dê serpêhatiya serhildanê li ser zimanê Qado an jî dê Qado bê keştîyê û çîroka serhildanê ji tûrikê xwe derxîne û ji her kesî re vebêje, lê ew yek nabe, serhildan di wî beşê de dimîne. Eger hin kesayetiyan din serpêhatiya serhildanê di ifadayên xwe yê bi elmanan re ji bo girtina mafê penaberiyê, bikar tînin jî, lê nivîskar wê diyar nake, tenê navnîşana “Vedenga janên welêt li kolanên biyaniyê dijenin” dikare ji bo gelek penaberan bibe çîroka ifadeya penaberiyê. Nivîskar baş kir ku ew beş wek dîrok di romanê de aniye ziman û gelek penaberên li keştîyê bê ku eşkere bikin, ji bo pêşeroja xwe û jiyana piştî keştîyê bikar bînin. Xala herî balkêş di vî beşê de şeweyê nivîsandinê ye, bi hosteyî hatiye nivîsandin.

Nivîskar hema hema kesayetiyan her çar perçeyên Kurdistanê digihîne ba hev û civaka kurdan bi riya wan diyar dike, her kesek bi rolekê radibe. Mirov dikare bêje ku her kesek bi serê xwe nimûneyek zindî ye ji civata ku jê hatiye. Her wisa rol û nîrxê jinê jî bi bîra nake, bi riya Sara û Cîhana Duhokî du nimûneyên cuda û berevajî hev diyar dike. Di rûpela 39an de dinivîsîne:” -Îro meş sar e ha, ji ber ku Sara ne li vir e, reşê gelek xortan jî nexuyaye, pêjna wan nayê”.

Roman wek tecrubeya yekemîn, bi zimanekî rihet û hesan hatiye nivîsandin. Dema min roman dixwend, tim pîrsekê xwe davêt ser rûpelan: eger nivîskar wek penaber li “Keştîya Penaberan” bi cih nebûya, gelo dê ew roman binivîsinda?, em vê pîrsê ji nivîskarê romanê re dihêlin.

Qado Şêrîn

Bi bihaneya salvegera wefata

Mîr Celadet Bedirxan

Pênûsa Nû bi vê nivîsê wî li bîra we tîne



Mîr Celadet Bedirxan : 26 Avrêl 1893 - 15'ê tîrmeh 1951

Celadet yek ji lawên malbata mezin a kurdan Malbata Bedirxaniyan bû. Ew wekî pêşengê nivîsîna kurdî bi tîpên latînî tê nasîn. Di warê lêkolînên li ser zimanê kurdî de gelek xebitîye û li surgûn û nefiyê kovarên Hawar û Ronahî weşandiye. Xebatên Celadet bûn bingeha edebiyata Kurmancî ya hemdem. Di jiyana xwe ya siyasî da, Celadet beşdarî gelek çalakîyên neteweperwerane bû, ew endamê Xoybûnê û yek ji damezrînerên wê bû. Piştî şerê Bedirxaniyan dijberî Sultan Ebdilhemîdî, tevî malbata xwe ber bi Yemenê ve hate surgûn kirin. Piştî ku tevgera rizgarîxwaza Tirk bi serokayetiya Mistefa Kemal Atatürk bi serkeft, mafên Kurdan hatin berbendkirin, di vê demê da fermana bidarvekirina Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî derket. Emîn û lawên xwe Sureya çûn Misrê, Kamûran û Celadet jî çûn Almanyayê. Wan li wir dest bi xwendina bilind kir. Celadetî xwendina bilind qedand û bawernameya doktoraya Hiqûqê wergirt. Li sala 1930ê, ew hat bajarê Şamê û dest bi xebata niştimanî kir. Di nav zebata Xoybûnê da endamê pêşeng bû, ew yek ji beşdar û alîkarên Serhildana Agirî bû.

Ji bilî zimanê kurdî Mîr Celadet bi van zimanan jî dizanibû: Ingilîzî, Fransî, Almanî, Tirkî, Farişî, Erebbî, Yunanî. Kovarên Ronahî û Hawar bi sernivîskariya wî derdiketin.

Nifşa sêyem a Malbata Bedirxaniyan di serê sedsala 20ê da bi Celadet, Kamûran û Rewşen Bedirxan ve destpêdike û xelesa vê malbata serhildêr ya dawiyê ye. Bêguman di xelesa dawin a Bedirxaniyan da Celadet Bedirxan cîhê herî giring digre. Celadet Alî Bedirxan an jî bi navekê din Mîr Celadet li 26ê Nîsana sala 1893ê li Stenbolê hate dinyayê. Bavê wî siyasetmedar û rewşenbîrê navdar Emîn Alî Bedirxan e ku ew jî yek ji kurên Mîr Bedirxan e.

Dema Celadet ji dayik bû, malbata wî li Stenbolê li sirgûnê bû. Dayika wî Senîha Xanim Çerkez e.

Bavê wî Emîn Elî Mufetişê Dadgeha Stenbolê bû. Her wiha, wî li wan salan da di nav tevgera Kurdan da jî cihekê giring digirt.

Ji ber ku Osmaniyan qedexa kiribû malbata Bedirxanî biçin Kurdistanê, Emîn Elî ji bo gihandina zarokên xwe bi çand û zimanê Kurdî ji Kurdistanê çîrokbêj dengbêj û mamostayên ziman û qerwaşan dianîn. Yek ji wan nivîskaran jî Helbestvanê navdarê Kurd Hecî Qadirê Koyî bû ku ew mamosteyê serekiyê zarokên Emîn Elî Bedirxan bû.

Celadet tevî xuşk û birayên xwe yê din li ber destê wan mezin bû. Her wiha Bedirxanî ji Stenbolê bi malbatên li sirgûnê yê wekî Şemzînî, Babanî û Cemilpaşayan re jî hevalbendî dikir.

Osmaniyan li malbata Bedirxan gumanan dikirin. Lewma karê fermî didan ber wan û her tim cihê wan diguherandin. Celadet di zaroktiya xwe de tevî bavê xwe di van sirgûnan da derbas kir û li bajarên wekî Stenbol, Isparta , Edirne , Konya, Aqqa, Nahlûs û Selanikê geriya.

Di 18 saliya xwe da Celadet li Stenbolê dest bi dibistana Medresaya Harbiyê dike. Di salên Şerê cihanî yê yekê da ew wekî mamosteyê gihanidina zabitên xebitî û di ser da li eniya Qefqasê li dijî Rûsan şer kir.

Piştî ku di encama şer da Imperatoriya Osmanî têkçû, û di nav welatparêzên Kurd da pêvajoya rêxistinê destpêkir, Celadet li Stenbolê ket nav karên siyasî û bû yek ji hîmdarên Komela Vêkxistina Civaka Kurd. Ew li pey derfeta damezrandina dewleteka Kurdî bûn.

Piştî şer dewletên serkeftî yê wekî Brîtanayê li Kurdistanê ketin hin hewldanan. Celadet li sala 1919ê tevî birayê xwe Kamûran û Ekrem Cemîl Paşa û Faîq Tewfîq çû Kurdistanê. Li cem wan.

Zabitên Siyasî yê Brîtanî Major Noel jî hebû. Armanca wan amadekariyên Peymana Sewrê bû

Kemalîstan ku ji gera Celadet û hevalên wî haydar bûn suwar şandin ser wan û ew mecbûr kirin bizivirin. Celadet di vê gera xwe da heta Meletiyê li Kurdistanê geriya û li ser rewşa welat serwest bû.

Di encamê da, li Sewrê, di bin çavdêriya berdevkê Kurdan Şerîf Paşa , hin mafên netewî hatin nîşankirin. Celadet di vê gera xwe ya Kurdistanê da di nav eşîran da gelek metelok, peyv û çîrok jî kom kirin. Li sala 1922ê, dema Kemalîst hatin ser hukmî û Stenbol bidestxist, ji bo serokên Kurdan ku di nav wan da Bedirxanî jî hebûn, fermana mirinê derçû. Li ser vê yekê, Celadet tevî birayên xwe Kamûran, Safter Tewfîq û birazayê xwe Heqî ve li sala 1923ê berê xwe da Almanyayê û li wir dest bi xwendina li zanîngê kir. Li sala 1925ê, dema li bakûrê Kurdistanê serhildana Şêx Seîdê Pîran destpêkir, Celadet ji bo tevlîbûna serhildanê bi dizî hate Kurdistanê. Lê heta ku ew giha welat serhildan hatibû şikestin. Ew careka din bi alîkariya eşîrên koçer ji Kurdistanê derket û zivirî Almanyayê

Di vê navberê da, birayê wî yê biçûk Safter li Almanyayê ji ber nexweşiyê mir. Birayê wî yê din Tewfîq jî zivirî Tirkîyê û li wir bi zora Kemalîstan paşnavê xwe kir Çînar û ket xizmeta Tirkan. Vasif Çînar birazayê Mîr Bedirxanî jî di vê demê da ji aliyê Mistefa Kemalî ve wekî wezîrê perwerdeyê hatibû wezîfedarkirin. Vasif Çînar ji malbata Bedirxanî hatiye derxistin.

Kamûran piştî hatina Celadetî li Almanyayê ma û doktoraya xwe ya hiqûqê dawî kir.

Mîr Celadet piştî dawîkirina zanîngeha hiqûqê bêyî ku doktoraya xwe temam bike hate Qahîre ya Mîsrê. Bavê wî Emin Elî li ser doşega mirinê bû. Piştî mirina bavê xwe çû Beyrûtê û li wir bicîh bû. Di van rojan da, li Sûriyê û Beyrûtê gelek rewşenbîrên Kurd civiyabûn. Kemalîstan piştî serhildana Şêx Seîdî careka din berê xwe dabû rewsenbîrên Kurdan. Yê ku ji ber kêra wan filitîbûn, berê xwe dabûn binxetê.

Celadet piştî ku hate Beyrûtê ket nava tevgera welatparêzên Kurd. Di vê navberê da, hewldanên damezrandina rêxistineka neteweyî jî destpêkiribû.

Piştî tevîbûna Celadet, li 5ê Îlona sala 1927ê li Lubnanê li bajarê Bêhemdûnê kongreya damezrandina Xoybûnê pêkanî. Di nav damezrênerên Xoybûnê da ji bilî Celadetî rewşenbîrên wekî Dr. Nurî Dêrsimî, Qedrî Can, Dr. Nuredîn Zaza, Memdûh Selîm Wanlî, Hemze Bêgê Muksî, Ekrem û Qedrî Cemîl Paşa û serekên herêmî yê wekî Haco Axa, Emînê Perîxanê, Mistefa Şahin Begê Berazî, Bedredînê Hebizbinî û gelekên din jî hebûn.

Yek ji biryarên Xoybûnê ew bû ku ew ji bo piştigiriya serhildana Araratê li herêma sinorê binxetê têkevin nav hewldanên leşkerî.

Bi vê armancê Celadet tevî Haco Axa û Resûl Axayê Miheme li herêma Torê tevî suwarên Kurd êriş birin ser qereqolên Tirkan.

Lê ji ber ku ew negihiştin armancên xwe, Celadet berê xwe da Çiyayê Araratê û tevî serhildêrên Serhedê bû. Li dûmahiyê, ev serhildan jî têkçû û wî tevî Ihsan Nûrî Paşayî xwe avêt Îranê.

Li Tehranê Şahê Îranê Mehmed Reza Pehlewî xwest wî bi hin bertîlan ji tevgera Kurdan dûr bike û li deverêka cîhanê jê ra konsolosiya Îranê pêşniyaz kir. Ji ber ku Celadet ew daxwaza Şah qebûl nekir, ew her wê demê ji Îranê hate derxistin. Piştî Îranê, Celadet demekê li Başûrê Kurdistanê û li Bexdayê ma. Lê Ingilîzan nexwest ew li Îraqê bimîne û rê li wî tengkir. Ew careka din jî bi neçarî zivirî Sûriyê û li Kurdîstana rojava xebata xwe meşand.

Li wir tevî endamên malbata Cemil paşayan, Hemzeyê Muksî û Haco Axa bi navê Civata Alikariya Kurdên Belengaz komeleyek damezrand. Armanca wan ew bû alikariya Kurdên ku ji bakûr revîbûn bikin. Sûriyê wê demê di bin dagirkeriya Fransayê da bû û tîkiliyên Fransî û Kemalîstan baş bûn. Ji ber zixtên Tirkan, Fransiyayê jî nedixwest ew li Kurdistanê bimîne. Li Tebaxa sala 1930ê tevî rewşenbîr û serhildêrên Kurd ên din bi zorê li Şamê hate bicîhkirin.

Xebatên siyasî ên bêencam û dorpêçana dewletên serdest berê Celadetî dabû rêyeka din. Rewşa herêmê jî êdî dest nedida ku Kurd ji bo hevkarîyê dewleteka alîgir bibînin an jî serhildaneka neteweyî birêbixin. Hin sedemên din jî ku Celadet her bi rewşeka nû ve dehf dabûn, rewşa navxweyî ya Kurdan bû. Di nav Kurdan da xwendin û nivisandin û karê rewşenbîrî gelek kêr bû. Li dûmahiyê, ew gehîşt bû wê baweriyê ku ji bo şiyarkirina Kurdan divê karê rewşenbîrî bike û biryara xwe da.

Li rojên sirgûniya Şamê Celadet dest bi karê zimanzanî û afirandina elfûbêyeka Kurdî kir. Celadet ji bilî Kurdî bi zimanên Tirkî, Erebî, Farisî, Frensî, Rûsî, Yûnanî, Almanî û Ingilîzî dizanibû. Li gor fikra Celadetî, ew li encama muqayeseya gelek ziman û elfûbêyan gihîşt hindê ku elfabeya Latînî dikaribû berî li nivîsîna Kurdî vebike. Ji xwe ew ji sala 1919ê ve xwedî vê baweriyê bû û li Almanyayê li ser etîmolojîyê jî xebitîbû.

Helbet, ji bo pêkanîna raman û îdealên xwe kovarek ji wî ra lazim bû. Li sala 1931ê ji dewleta Fransî destûr girt ku li Sûriyê kovarekê derbixe.

Piştî amadekariyan, li 15ê Gulana 1932ê hejmara yekê ya Hawarê gihand xwendevanan. Armanca Mîr Celadet ewe bu ku alfebeya Kurdî latînî bi vê kovarê li seranserê Kurdistanê belav bike. Mîr Celadet li kovara Hawarê de jî diyar kiriye ku ji bo yekxistina alfabeya kurdî çendî name ji bo Tewfîq Wehbî nivîsandine, lê mixabin tu bersîv wernegirtiye. Ji ber wê yekê jî li kovara Hawarê de dest bi nivîsandina zaravayê Soranî (latînî) kiriye.

Her li wê salê kitêba xwe ya gramere a bi navê Rêzimana Elfabê ya Kurdî çap kir.

Celadet Bedirxan li Şamê di rewşeka nebaş da dijiya. Kemalîstan li Tirkîyê dest dabû ser hemî mal û mulkê malbata wan. Celadet ji ber sedemên aborî mecbûr ma ku mamostetiya zimanê Fransî û parêzeriyê bike.

Ew li kolana Salihîye di odeyekê da dima. Ev ode navenda Hawarê, mêvanxane û cihê razanê jî bû. Çavên wî li bendê bûn ku careka din derfetekê bibîne ku bikare biçe Kurdistanê. Lê piştî ku serhildana Malbata Eliyê Yûnis jî hate tefandin, wî fahmkir ku di paşeroja nêz da ew derfet çênabe.

Ji bo vê yekê wî biryara zewacê girt û li sala 1935ê li Şamê bi dotmama xwe Rewşen Xanimê ra zewicî. Rewşen xanimê wê demê mamosteyî dikir.

Di zewaca wan da bi navên Cemşîd û Sînemxan du zarokên wan çêbûn. Her wiha, kurekê wan bi navê Safter jî hîn di yeksaliya xwe da miribû. Keça Rewşenxanê ya ji şûyê (mêrê) wê yê yekê bi navê Useyma bû li ba wan dima. Ji zarokên Celadet, Cemşîd li Almanyayê doktorî xwend û li sala 1999ê çû ser dilovaniya xwe. Ji Cemşîd kurek û keçek bi navên Kurd û Evîn hene. Kurd li Almanyayê doktorî qedandiye û niha jî li wir karê xwe didomîne. Evîn jî çalakvaneka civakiye û ew jî niha li Almanyayê dijî.

Her wiha, keça wan Sînemxan niha tevî malbata xwe li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê dijî. Sînemxan li gel nivîskar û endezyarê neftê Salah Sadallah (Nivîskarekî Kurde û nêzîkî 25 berhemên wî hene) jiyana hevjinîyê pêkaniye û wê jî du zarokên bi Navê Dilnaz û Azad heye. Dilnaz li Zanîngeha Sorbuna Fransa beşa wergeriyê qedandiye û niha jî li gel zarokên xwe (Civan, Mîro, Alan) li Parîsê dijî. Azad Endezyarê Elektrîkêye û wî jî kurek bi navê Alan heye.

nû ve çap bike. Heta niha nêzîkî bîst û pênc berhemên Bedirxaniyan û berhemên hevîna xwe Salah Sadallah çap kiriye. Niha bernameya wê ya herî girîng amadekirina Ansiklopediya Bedirxan e ku îsal 15.05.2011 li roja derxistina kovara Hawarê amadekariyên Ansiklopediya Bedirxan hate ragihandin. Armanca vê Ansiklopediyayê ewe ku hemû berhemên Bedirxaniyan li nav vê ansiklopediyayê kom bike û pêşkêşî xwendevanên Kurdî bike. Useyma jî niha tevî malbata xwe (sê keç Şîrîn, Nesrîn, Ruşen) li Beyruta Lubnanê dijî. Bi destpêka Şerê Cîhanî zextên siyasîyên li ser rewşenbîrên Kurd li Sûriyê careka din destpêkir. Dewleta Fransî di nav salên 1943ê û 46ê da bi zorê rûniştina li Şamê li ser Celadet ferz kir. Qedexe bû ku ew ji Şamê derbikeve. Ev bi zorê rûniştina li Şamê ji aliyê rejîma Sûriyê ve jî heta 1948ê hate domandin. Piştî destpêka Şerê Cîhanî yê Duyê Celadet dest bi karên rojnamevaniyê kir û li sala 1942ê li Şamê Kovara Ronahî weşand.

Pênc hejmarên Ronahiyê yê pêşîn li ser nûçeyên Şerê cîhanî bûn. Di demên paşîn da jî êdî Ronahî kovareka xwerû Kurdî bû û bi nivîsên li ser ziman, wêje û çanda Kurd hatibû xemilandin. Piştî ku li sala 1943ê Hawar hate rawestandî jî, Mîr Celadet giranî da ser Ronahiyê.

Hingê birayê wî, Kamûran, jî li Lubnanê kovareka Kurdî-Fransî bi navê Roja Nû derdixist. Serpêhatiya kovara Ronahî jî heta sala 1945ê ajot.

Mîr Celadet di jiyana xwe ya rewşenbîrî da ji bilî xebatên kovar derxistinê gelek kitêb jî nivîsîn. Her wiha, ji bilî kovarên ku wî derdixistin, di gelek kovarên Kurdî û yê zimanên din da jî nivîsiye. Ji ber tengasiyên aborî, Mîr Celadet li sala 1950ê li gundê Hecanê, ku nêzî Şamê bû, dest bi karê çandinê kir. Ji bo debara malbata xwe, ew mecbûr mabû karekî wiha bike.

Her çende gelek hevalên wî yê dewlemend hebûn û wan dixwest alîkariya wî bikin jî, wî alîkarî qebûl nedikir. Li Gundê Hecanê ji bo avdana pembûyê zeviyên ku diajot bîreka mezin kola. Di nameyên ku ji malbata xwe ra dinivîsîne navê wê bîrê danîbû Bîra Qederê.

Mîr Celadet li 15'ê Tîrmeha sala 1951ê li gundê Hecanê nêzîkî Şamê çû ser dilovaniya Xwedê û termê wî li kêleka bapîrê wî, Mîr Bedirxanî, li Goristana Mewlana Xalidê Nexşebendî li taxa Kurdan li Şamê hate veşartin.

Li van salên dawî de hinek nûçe derdikevin ku qaşo Celadet Bedirxan ji aliyê dezgehê hewalgiriya (îstîxbarata) dewleta Suriye ve hatiye kuştin. Lê belê heta niha tu belgeyek di vî derbarî de tûneye û zarokên Mîr Celadet (Sînemxan û Useyma Bedirxan) jî di vî derbarî de didin zanîn ku ev nûçe bê bingehein û ji gote gotan pêkhatiye.

Têbînî: Ev jiyanname ji aliyê Sînemxan Celadet Bedirxan ve hatiye serrastkirin. **(17.07.2011) Ji wikipedia kurdî**

Amer X. Mourad



amer.x.mourad@gmail.com

Sînor

dibêjun rengê mun rengê reş
rengê hemî lîn û çax û roja
bermayî doja ber tava roja
roke tenê sîpî xwe dtheja
lê rengê mun rengê hemî doza

* * *

tî wên pora dirêjî reş dîzî bî dîzî
derdê mun û kêf xweşiyê dikê yek kezî
û herdû çavê te tek ji hev dîkîn gazî
û lêv şerê wan grane tek lî mun nazî
gava te dibînim tîstek namîne xwezî

* * * *

hijmara bîyanîyê maye bê ta û derzî
sîka dema pîr ji hêvî û soza derzî
şûna xelesa zîv ji derdê zêrîn te rîzî
gewdê sînora lî gava dikê lez û bezî
sînora bê zuravî burîna wan maye tazî



Qesra Îshaq Paşa

Qesra Îshaq Paşa, Koşka yan Palasa Îshaq Paşa yek ji koşkên navdar ên Bakurê Kurdistanê ye û li axa Bazîdê ye.

Koşk ji aliyê Îshaq Paşa ve, di sala (1199 Hîcrî.)-(1784 Mîladî.) hatiye avakirin. Gorî dîroka fermî ya Tirkan di nava 99 salan de avakirina wê hatiye bidawîkirin. Mîmariya koşkê elementên Kurdî, Roma û Farsî (bo mînak Selçûkî) dihewîne. Sûrên wê bi nexşên giranbiha hatine nexşandin. Di avakirinê de koşk du qatî bûye lê qata jorîn êdî nemaye.

Koşk gelek caran ji aliyê dewlet û mîrîtiyên Kurdan ve hatiye restorekirin. Di wejeya Kurdî gelek caran bûye kaneke navdar. Ehmedê Xanî jî li heman koşkê jiyaye û perwerde daye. Niha goristana Xanî li wir e. Mûsa Anter gelek caran koşk wekî "Tirba/Goristana Ehmedê Xanî" binavdikir. Dîsa Mizgefta Bazîdê jî li cem wê ye.

Di dagîrkirina Rûsan a salên 1828 – 1829'î de, deriyê koşkê yê xwerû zêrîn bû, hatiye birin û niha li mûzeyê Moskowê tê parastin. Li koşkê hemam, mizgeft, goristan, kulîn, hewliya xwarinê, salona pêşwaziyan, harem û sistema germkirina hilmê (wekî kalorîferên îro) heye.

Ji Wîkîpediya

Ebdulrhman Brahîm Elî ano ya Kurdî li Sûrî çima tune?

Şano neynika gelaye bi dîroka wan ,bi kevnetorê wan,bi civaka wan ,bi xweşî û ne xweşiya wan.ji roja ku □ano derbasbû welatên ixrîqiyân li ser destê -Esxîlos- Sofoklîs-Yorbîdis- û ta roja îro her miletek dixebiteû kardike ku Şaniweke taybet bixwe avabike di hundirê wêde her tiştê xwe bide xuyanî (dîroka xwe - filklor û serpêhatiyên xwe - rewşa xwey civakî - rewşa xwey çandî û siyasî) û her wiha her miletekî muhra xwey netewî li ser vî hunerê hêja xistiye lê ya giring ji mere wek kurd û bitaybet kurdin Sûryê.

ji bo Çi em bê mohrin ta niha?
gelo Çi sedem hene ku Şaniwa kurdî bi taybet mendiyêke kurdî li Sûrya?

helbet wê hin sedem hebin serdestî me , û hin em gunehkarin diberde û eve ya giring ji mere emê nuha hin ji van sedman li gorî nêrîna xwe bihejmêrin:

1--Mana(Şaniwa kurdî)di hundirê komên filklorî de (hizbî).

2--Ne avakirina komên taybet bi Şaniwê nemaze yê serbixwe.

3--Nerdewamiya kurdên Şanoger di hundirê (Şaniwa erebîde)bê ku li rexê kurdî binêrin wek ber pirsyar di ber vî mîletî û vî hunerî de.

4--Ne avakirina kesên Şanoger yê ku karibin berdewam bikin û vî barî Hilgirin.

5--Tunebûna nivîskarên Şaniwê wek nivîskarê çîrokê û helbestê.

6--Qut birîna dinavbera komên filklorîde.

7--Tunebûna vîstivalên Şaniwê.

8--Ne guhdan li zarokan û fêrkirina wan di warê Şaniwêde.

Pênûsa nû



Sernivîser

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Arşek Paravî

Desteya birêvebir

Pîr Rustem

Silêman Azer

Ezîz Xemcivîn

Abdilbaqî Huseynî

Lawîn Şêxo

Derhener

Xorşîd Şozî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com

